Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1186 14-Tîrmeh-2024 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Dîroka Bajarê Amûdê

**Amara Baran/Qamişlo**

**Bajarê Amûdê dikeve bakurê rojhilatê Sûriyê, 25 km li rojavayê bajarê Qamişlo ye, ji aliyê bakur ve dikeve rûbirûyê bajarê Mêrdînê yê Bakurê Kurdistanê ye. Hejmara niştecihên wê tevî gundewarên wê nêzî 200 hezar kesî ye û piraniya wan kurd in. Her wiha xirstiyan jî bi jimareke kêm li bajêr jiyan dikin û komek dêrên dîrokî yên herî kevn jî hîn li bajêr dimînin. 160 gundên girêdayî bajarê Amûdê hene, praniya wan gundê kurdan e.**

Bajarê Amûdê ku bi navê, bajarê bavê Mihemed, bajarê rewşenbîr û nivîskaran tê pênasekirin. Bajarekî xweşik û nazik ji bajarên Rojvayê kurdistanê ye. Amûdê an jî Orkêş bi navê beriya Mêrdînê jî dihat naskirin, Osmaniyan jî nav lê kir Girê Kemaliyê. Li ser navlêkirina bajarê Amûdê, li gorî kesên bi temen çîroka wê wihaye: “Keça şahê Mêrdînê kurekî xwînvexwar aniye dinê, ji ber wê jî şah ferman dide ku wî kurî ji wir derxînin û bibin nêzî girê Amûdê yê niha, lê dema ku rêwî di wir re derbas dibûn, dîtin ku zarokek bi amûdekê (stûnekê) ve girêdayî ye, wan rêwiyan ev çîrok belav kirin û bi wê herêmê re gotin Amûd.

Piştre gundek li ber wî girî hate avakirin, navê Amûdê li wî gundî kirin. Êdî ew ji gundbûnê veguherî bajarekî kevnare û dîrokî yê Rojavayê Kurdistanê. Tişta herî balkêş ewe ku heta niha jî gava mirov di ber vî bajarî re dibuhire, mirov rastî dîmeneke kevnar ji şaristaniya bav û kalan tê. Bi wî awayî bajarê Amûdê yek ji bajarên herî kevnare yê ser bi Rojavayê Kurdistanêye.

**Dîroka bajarê Amûdê:**

Dîroka bajarê Amûdê bi texmîna dîrokzanên ku dibêjin, berî zayînê bi sê hezar salî hatiye ava kirin. Di demên dawîn de Amûdê girêdayî Mêrdînê bû, piştî sala 1926’an û bi danîna sînor û parçekirina kurdistanê, bi bajarê Qamişlo ve hate girêdan û heta sala 1946’an piştî ku Fransa ji sûriyayê derket, bû navçeyek girêdayî bajarê Qamişlo. Piraniya şêniyên wê Kurd in û hejmarek jî xiristiyan lê dijîn. Amûdê li ser deştekê û li ser sînorê di navbera Rojava û Bakûrê kurdistanê de hatiye ava kirin, dikeve Başûrê bajarê Nisêbînê. Bajarê Mardînê jî ji Amûdê ve xûya dike. Amûdê nêzî 30 km ji bajarê Qamişlo dûr e û bi qasî 75 km ji bajarê Hesekê dûr e. Rûpîvana herêmê 990 hezar km ye.

**Demografiya Bajarê Amûdê**

Bajarê Amûdê dikeve bakurê rojhilatê Sûriyê, 25 km li rojavayê bajarê Qamişlo ye, ji aliyê bakur ve rûbirûyê bajarê Mêrdînê yê Bakurê Kurdistanê ye. Hejmara niştecihên wê tevî gundewarên wê nêzî 200 hezar kesî ye û piraniya wan kurd in. Her wiha xirstiyan jî bi jimareke kêm li bajêr hene û li bajêr komek dêrên dîrokî yên herî kevn hene. 160 gundên bajarê Amûdê hene, praniya wan gundê kurdan e.

Li başûrê Amûdê zêdeyî 10 gundên kurdên Êzidê hene. Ew li gundên Amûdê yên weke Merkebê, Dugirê, Qelaçix, Xirbê Xwê, Çetelê, Kuliyê, Xirbexezal, Gorseîd, Xirbedilan, Mîk, Hêşerî, Tolko, Berzan, Morîka, Enteriyê, Mehmûdiyê û Kerengo dijîn. Li 20 salên dawiyê piraniya kurdên êzdî derketin derveyî welat.

**Di warê çandiniyê de**

Piraniya xelkên Amûdê di warê çandiniyê de dixebitin, hinek ji wan jî di karên destan de dixebitin. Bajarê Amûdê li ser deştekê hatiye avakirin, bi havînan germ e û di zivistanan de jî sar e, ji aliyê baxçeyên daristanan û hawîrdorê ve jî xizan e. Li herêmê Çandiniya genim li pêşe û her wiha gelek



madeyên din jî mîn ceh, nîsk, nok û hwd ye. têne çandin û çandinî di aboriya herêmê de roleke mezin dilîz e.


**Şûnwarên dîrokî li bajarê Amûdê**

li Amûdê sê girên dîrokî hene, Girê Şermola, Girê Çaxir Bazar, Girê Mozan. Ji bo naskirina dîroka wan ya rastî, xûya dike ku dîroka wan vedigere ji beriya zêdetirî sê hezar sal.

**Çend bûyerên ku naynê ji bîrkirin**

Di sala 1936`an de Firensiyan bajarê Amûdê bi pênc firokeyên şer bombebaran kirin, ku ew piştî serhildana Seîd Axa Deqorî bû. Di 13`ê mijdara sala 1960`an de bûyereke xemgîn û bi şewat bi ser xelkê Amûdê de hat. Careke din agir bi dilê dayikan xistin, careke din dijmin hovîtiya xwe li ser gelê Kurd nîşan da. Vê carê armanc ji qirkirina nifşeke ji Kurdan bû. Di dema şoreşa Cezayîrê ya li dijî Firensiyan ya ku di sala 1954 an dest pê kir. Ji zarokên dibistanên Amûdê xwestin ku her yek ji wan 25 qirûşan bîne ji bo temaşekirina filmekê di sînema Şehrezar de, ji bo ku wan peran wekî alîkarî ji şoreşa Cezayîrê re bişînin. 500 zarok di sînemayê de kom kirin, piştî kêliyeke bêdeng agir bi sînemê ket, 284 zarok bûne qurbanî, ku yek ji qurbaniyan Mihemed Seîd Deqorî bû, ew kesê ku bi dehan zarok ji nava agir xelas kirin. Lewma piştî wê bûyerê bi Amûda bavê Mihemed hate naskirin.

Di taybetmendiya bajarê Amûdê de bi du tiştan cudayî bajarên kurdistanê yên din e, a yekê bi têkiliya xwe ya mezin bi wêjeyê re, ku gelek wêjevan, helbestvan û nivîskar ji wir derketine. Ya din jî bi dînên xwe têne naskirin, li Amûdê gelek dînên bi nav û deng hene, her yek ji wan jî xwedî çîrok û taybetmendiyeke cuda ye.



Sudoku: Bersiv 96

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 3 | 4 | 7 | 6 | 1 | 5 | 8 | 2 |
| 2 | 8 | 7 | 9 | 3 | 5 | 4 | 6 | 1 |
| 6 | 1 | 5 | 8 | 4 | 2 | 7 | 9 | 3 |
| 4 | 9 | 3 | 1 | 2 | 7 | 8 | 5 | 6 |
| 8 | 6 | 2 | 5 | 9 | 3 | 1 | 7 | 4 |
| 5 | 7 | 1 | 6 | 8 | 4 | 3 | 2 | 9 |
| 7 | 4 | 9 | 3 | 5 | 6 | 2 | 1 | 8 |
| 3 | 5 | 6 | 2 | 1 | 8 | 9 | 4 | 7 |
| 1 | 2 | 8 | 4 | 7 | 9 | 6 | 3 | 5 |

Sudoku:Pirs 97

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | | 8 | | | | | | |
| | 6 | 9 | | | 2 | | 1 | |
| | 4 | | 3 | 8 | | 5 | | 9 |
| | 2 | 3 | | | 4 | | | |
| 1 | | | | 9 | | | | 5 |
| | | | 1 | | | 7 | 2 | |
| 9 | | 2 | | 4 | 6 | | 7 | |
| | 3 | | 8 | | | 4 | 5 | |
| | | | | | | 8 | | 6 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Li rûyê wî da:**
- Di rûyê wî de got; li cem got; eşkere jê re got.

**Mirî di binê berrikê de nayê veşartin:**
- Wê ev mijar eşkere bibe; ev mijar bi vî awayî nayê veşartin.

**Nîvê hezaran pêncsed e:**
- Her tişt diyar e; her tişt li ber çavan e; nayê veşartin.

**Pê li birîna wî kir:**
- Kirinên wî yên xef eşkere kirin; sûcên wî eşkere kirin.

**Pidûyên wî derxistin:**
- Xefên wî tev eşkere kirin.

**Pîvaza wî spî bû:**
- Kumê keçeliya wî ket; durûtiya wî diyar bû; hat naskirin; derewên wî eşkere bûn.

**Rim di tûran de bi cih nabin:**
- Kengê be derew eşkere dibin; dereng be jî rastî derdikevin meydanê.

**Rim li tûr hilnayê:**
- Bi heman wateyê.

**Serî ketê:**
-Her tişt got; tiştek veşartî nehişt.

**Tiştek di bin de nehişt:**
- Kiryarên wî tev eşkere kirin.

**Tişket di binê cilikê de nehişt:**
- Her tişt eşkere kir.

**Tişta binê berrikê (yan doşekê) wê derkeve ser berrikê:**
- Tiştên bi dizî wê her eşkere bibin; hinek tişt nayên xefkirin.

**Tiştek di binê berrikê (yan doşekê) de nehişt:**
- Her tişt got; tiştên bi dizî, tiştên xef tev eşkere kirin.

**Weke benikê gorê verêsa:**
- Her tişt got; tiştek veşartî nehişt.

**Wê rûyî reş û spî ji hev kifş bibin:**
- Wê her tişt derkeve meydanê; ka kî rast dibêje wê diyar bibe.

**Xiyar spî kirin:**
- Her tişt eşkere kir; tiştek sergirtî nehişt.

**Xwe da dest:**
- Xwe eşkere kir.

**Xwedê ne pîvazan diqeşêre:**
- Xwedê her kesî nas dike.

**Xwêya xwe xwar:**
- Kela dilê xwe honik kir.

**LI SER BÊŞERMIYÊ**

**Avika rûyê wî teqiyaye:**
- Rûyê wî ji ti kesî naêşe; şerm nake; li ber xwe nakeve.

**Bi çermê rûyê xwe tê:**
- Ne bi xwesteka me tê; ji bêariya xwe tê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Pêwîste her kes bi Rêveberiya Xweser û QSD`ê re bibe yek dest’



Endama Partiya Yekîtiya Demokiratîk Arîfa Bekir diyar kir ku pêwîşte gelên li herêmên dagirkirî jiyana koletî û zorê qebûl nekin, herwiha daxwaza xeta demukiratîk a Rêveberiya Xweser bikin û bi hêzên QSD`ê re bibin yek, ji ber ku tenê ev riya çareseriyê ye.**R-4**

## KCDK-E: Li dijî dagirkerî, xiyanet û qirkirinê rabin!

KCDK-E’yê li dijî êrişên topyekûn ên dewleta Tirk a dagirker û xiyaneta hevkar a PDK’ê banga berxwedana topyekûn kir.**R-3**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1186 14-Tîrmeh-2024 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# BI RIHÊ BERXWEDANA 14’Ê TÎRMEHÊ DIJMIN Û XAYÎN ÎRO TÊK DIÇIN

Li dijî derbeya faşîst ya 12’ê Îlonê, li hemberî işkence û qirkirina kurdan, endam û kadroyên pêşeng yên PKK’ê di zindana Amedê de bi berxwedaniyeke bêhempa, di 14’ê Tîrmeha 1982’an de çalakiya rojiya mirinê ya mezin dan destpêkirin. Bi vîn û baweriyeke mezin canê xwe feda kirin û bûn sembolên berxwedanê. Endamê Komîteya Rêveber Ya PKK’ê Muzafer Ayata diyar kir ku berxwedana 14’ê Tîrmehê bû nexşerêya pêşeroja ciwanên Kurdistanê.**R-5**



## ‘Rewşa Sûriyê derfetê nade ku Esed û Erdogan bicivin’



Sekretêrê Partiya Çepa Demokrat a Kurd li Sûriyê Salih Gedo anî ser ziman ku rewşa Sûriyê û kiriyarên dagirkeriyê derfetê nadin Beşar Elesed bi Erdogan re bicive. Herwiha Gedo da zanîn ku Rêbeberiya Xwser hîmê bingehîn ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê ye.**R-3**

## Kargeha Lîlît çanda kurdî diparêze



Jin di hemû warên jiyanê de hebûna xwe diyar dikin. Dizaynera Kargeha Lîlît Nûrhan Abdullah, têkildarî kargeha Lîlît û kar û xebatên ku jin di kargehê de dimeşînin ji rojnameya me re axivî.**R-2**

## Qehwexaneya Kewê yek ji kevneşopiyên Amûdê ye



Qehwexaneya Kewê ya Amûdê taybetmendiyeke wê ya cûda ji qehwexaneyên din heye, ev qehwexane avahiyeke ku bi heriyê di sala 1954`an de ji aliyê Mihemedê Kewê ve hatiye avakirin û heya niha ji aliyê kurê wî ve tê parastin. Ebdulqadir kurê Mihemedê Kewê diyar kir ku Qehwexane yek ji kevnareyên civaka Amûdê ye.**R-6**

Zozan Cizîrî
‘Di dîroka mirovahiyê de hezîrana herî germ’ R-2


Ahmed Aktaş
Mesûd Berzanî çima çû Bexdayê? R-4


Hafiz Ahmet Turhalli
Nijadperestî û îslam R-6


Sîpan Şînda
Bawerî Yan Rik R-7

# 'Divê jin li dijî her cure êrişan xwedî helwest bin û têbikoşin'

Bêrîvan Demîra li Mexmûrê mamoste ye diyar kir ku sedema hemû êrişên li dijî jinan pergala baviksalar e û got: "Ji bo em jin xwe ji pergala baviksalar rizgar bikin û azadiya xwe bi dest bixin divê piştgiriya hev bikin û berxwedaneke mezin bidin meşandin."

**Navenda Nûçeyan**



Li seranserê cîhanê û bi taybetî li Rojhilata Navîn jin rojane rastî êrîşan tên û bi qetilkirinê re rû bi rû dimînin. Jin herî zêde ji aliyê mêrên herî nêzî xwe ve bi hincetên namûsê rastî tundiyê tên û tên qetilkirin. Bi taybetî di demên dawî de li Başûrê Kurdistanê rêjeya qetilkirina jinan gihîşt asta herî jor.
Bêrîvan Demîr a li Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) mamostetiyê dike der barê tundî û qetilkirina jinan ên di demên dawî de gihîştiyê rêjeyek pir zêde.
Bêrîvan Demîr di destpêka axaftina xwe de got ku li seranserê cîhanê jin rastî her cure êrişan tên û wiha axivî: "Di demên dawî de jin bi rêjeyeke zêde tên qetilkirin. Di roja me ya îro de jin rastî îşkence, şewitandin û qetilkirinên hovane tên û mafên wan tê binpêkirin. Bi taybetî di van salên dawî di rêjeyekê asta herî bilind de ye. Li hemû deverên cîhanê êriş li ser jinan tê kirin û armanc biçûk xistina jinan e. Di sedsala 21'emîn de ku sedsalek modern û peşketî tê dîtin, ruxmê qaşo vê pêşketinê jî lê rewşa jinan gelek bi xeter e. Bi taybetî li Rojhilata Navîn jin li gorî asta cîhanê herî zêde rastî qetilkirinê tên. Ji bo mafê jinan tu zagon nayên bicihanîn. Ev qetilkirin û îşkence bi destên mêr, diktatoran û bi destê dewletan tê kirin."

**'Divê em zextên li dijî xwe qebûl nekin'**

Bêrîvan Demîr, diyar kir ku li Başûrê Kurdistanê rojê jinek tê qetilkirin û wiha got: "Divê jin li hemberî vê yekê xwedî helwest bin. Di ferqa rastiya xwe û pîrozbûna xwe de bin û nehêle ev yek ser jinan bê ferzkirin. Ji ber ku dema em li dîroka jinan mêze dikin, dibînin ku jin xwedî mîtolojî, destan û çîrokên cur bi cur in. Ji ber vê divê jin di ferqa hêza xwe de bin û divê li cihên ku jin dijîn azadî bê misogerkirin. Ji ber ku mebesta jinan a jiyanê azadî ye. Divê em weke jin her dem di nava lêpirsînê de bin ku çima mafê jiyanê ji jinan re nayê dayîn. Divê em vê yekê ji bo xwe qebûl nekin."
Bêrîvan Demîr, di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku sedema hemû êrişên li dijî jinan pergala baviksalar e û wiha got: "Sedema hemû êrişên niha li dijî jinan tên kirin, pergala baviksalarî ya îro tê meşandin e. Ji ber ku ger di nava malbatê mafê jin neyê dîtin, ger jin biçûk bê dîtin, guhdayîna dengê jinan nebe, mafê wê yê axaftinê tunebe divê em bizanibin ku ev berdewamiya pergala baviksalarî ye û ev pergala baviksalar di roja me ya îro de destên xwe hîn zêdetir xurtir kiriye."

**Li ser jinan bandora polîtîkayên şer**

Bêrîvan Demîr bal kişand ku bi polîtîkayên şer bêtir bandorê li ser jinan dike û wiha got: "Şerên ku di roja me ya îro de diqewimin, bêkarî, rewşên aborî, koçberî û xizanî dibin sedema têkçûna malbatî. Ger jin jî di vê mijarê de bê zanebûn, bê perwerde bin û ger nikaribin dîroka xwe bizanibin dê winda bikin. Ji bo vê çi pêwîst e em li hemberî vê pergala hovane ya ku bi taybetî êrîşê bedena jinan dike, êrîşê destkeftî, çand û hemû cure rengîniya jinan dike têbikoşin. Ne tenê li bakur, başûrê Kurdistanê li hemû cihên jin lê dijîn, jin tên qetilkirin, tên tacîzkirin û mafên wan ji destên wan tên girtin. Jin weke amûrên reklaman tên bikaranîn."

**'Divê jin li dijî her cure êrişan xwedî helwest bin û têbikoşin'**

Bêrîvan Demîr, diyar kir ku divê jin li dijî pergala desthilatdar têbikoşîn û wiha axivî: "Divê em vê yekê bi zanibin jina ku bixwaze xwedî li çanda xwe derbikeve, xwe li ser lingan bigre, malbatek demokratîk ava bike yan jî mafên xwe bi dest bixe divê têbikoşe. Divê em li dijî vê pergala baviksalar, dagirker û feodaliya heta roja me ya îro bi navê şêx, beg, mela û bav tê meşandin, derbikevin û têbikoşin. Bi taybetî jî divê jin mafên xwe bizanibin û li hemberî vê têbikoşin. Divê jin têkoşînê bimeşînin û vê pergalê hilweşînin. Çawa îro jinek li başûrê Kurdistanê bêşewîtandin û hemû kes bê helwest bimîne. Li Rojhilatê Kurdistanê jin tên qetilkirin, jin bê helwest in. Ev yek qebûlkirin û wek qedera xwe dîtin e. Divê jin li dijî her cure êrişan xwedî helwest be û têbikoşe. Divê em xwe, malbat û zarokên xwe perwerde bikin."

**'Pêwistî bi guhertina hişmendiyê heye'**

Bêrîvan Demîr, da zanîn ku pêwîstî bi guhertina feraseta serdest a baviksar heye û wiha got: "Pêwîstî bi guhertina feraseta serdest ê baviksalar heye. Divê em feraseta ku xweşiktiya jinan di aliyê fîzîkî de şîrovê dike biguherînin. Pêwîst e xweşiktî di aliyê mejî de be. Xweşiktiya herî xweşik pêşengiya civak, malbat û zarokan e. Divê em mafên jinan ên aydê xwe biparezin. Ji bo ku jinek bibe pêşenga civak û malbata xwe, divê xwedî hêz be. Divê em weke jin xwe bikin xwedî hêz. Divê em jin bi mejî û aqilê dewlet û desthilatdariyê neyên birêvebirin, bi hêza xwe bên birêvebirin."

**'Kujerên jinan bêceza tên hiştin'**

Bêrîvan Demr, diyar kir ku qetilkirina jinan rewa tê dîtin û wiha got: "Di demên dawî de rêjeya qetilkirina jinan pir zêde bûye. Bi taybetî jî li Iraq û başûrê Kurdistanê rojane jin tên qetilkirin. Her wiha rewşa xizanî û aborî jî dibe sedema tundî û qetilkirina jinan. Di heman demê de teknolojiya ku îro pergal birêve dibe jî dibe sedema tundiya li dijî jinan. Bi taybetî jî kiryarên li dijî jinan rewa tên dîtin û kiryar bê ceza tên hiştin. Li Iraqê hewl tê dayîn benda 57'an zagonê ku bi taybetî ji bo mafên kesî û di berjewendiyên jinan e, were guhertin. Hewl didin zarokan ji dayikên wan bigrin û radestî bav bikin. Ji ber ku dixwazin jinan bê maf bikin, hewl didin yekane madeya têkildarî jinan jî biguherînin.

**'Ji bo jinan perwerde xwedî girîngiyek mezin e'**

Bêrîvan Demîr, di dawiya axaftina xwe de bang li tevahî jinan kir ku li dijî êrîşên heyî berxwedanek mezin bidin û wiha axivî: "Divê em li dijî tevahî êrîşan bikaribin zêdetir xwe û civaka xwe zana bikin. Em encax dikarin bi têkoşîneke mezin, li dijî van êrişên li ser jinan rawestin. Ji bo jinan perwerde xwedî girîngiyek mezin e. Divê em weke jin rastiya xwe bizanibin. Pêwîst e em ji bo pirsgirekên ku em wek jin dijîn, çareseriyên mayînde peyda bikin û wek hemû jinên cîhanê hev fêm bikin. Ji bo ku em weke jin xwe ji pergala baviksalar rizgar bikin û azadiya xwe bi dest bixin divê piştgiriya hev bikin, helwesta rast nîşan bidin û berxwedanek pir mezin bimeşînin."

## Ramangeh



### 'Di dîroka mirovahiyê de hezîrana herî germ'

**Zozan Cizîrî**

Îsal cîhan bi giştî havîneke rêjeya germahiya xwe herî bilind jiyan dike. Li gor daneyên Servîsa Guhertina Bahewayê ya Copernîcus a girêdayî Yekîtiya Ewropa (YE), meha hezîrana 2024'ê di dîroka mirovahiyê de wekî hezîrana herî germ derbasî qeydan bûye. Îfadeya "di dîroka mirovahiyê de hezîrana herî germ" ji rêzê nîn e û nabe mirov hema sere derbas bibe. Servîsa Guhertina Bahewayê ya Copernîcus ku di asta YE de xwedî nasname ye, dilxwede bi aqilekî zanistî tevdigere. Baş e ev saziya ku vê daneya evqas xeter tespît û eşkere dike, çima sedema wê destnîşan nake? Li gorî ku dikare vê encamê tespît bike, diyar e sedema wê jî baş dizane. Bi taybetî ji sala 2018'ê ve her demsala havînê ji ya berê germtir derbas dibe. Lê rastiyeke din jî heye; ev germbûna di asta şewitandinê de jixweber, xwezayî nîn e! Tu saziyeke aqilmend û berdevkê hêzên modernîteya kapîtalîst nikare vê rewşê girêdayî felaketên xwezayê rave bike. Ya rastî ji sala 2018'ê ve çi diqewime?
Tenê li herêma me ya Bakur-Rojhilatê Sûriyê, ji sala 2018'ê ve her sal dewleta Tirk û çeteyên wê tam di meha Hezîranê de bênavber agir berdide zeviyên dexl û zadan, li herêma Efrînê ku bi zeviyên zeytûnan û darên fêkiyan ên cur bi cur dewlemend û rengîn bû, ji çaxê dagir kirî ve ew herêm kiriye çolistan. Li Bakurê Kurdistanê ji aliyekî ve agir berdide daristanên çiyayên Kurdistanê, ji aliyê din ve bê kontrol daristanan dibire, rojane çekan bikar tîne. Li çiyayên Başûrê Kurdistanê şerekî bê exlaq li hember gerîlayên azadiya Kurdistanê dimeşîne, ji bo vê rojane çekên kîmyayî, gazên jehrî bikar tîne, agir berdide daristanan û li cihê derfet dibîne dest bi birîna daran dike. Li herêmên milê Derya Reş li cihên ku dixwaze kanên me'denan veke û gel li dijî derdikeve, agir berdide daristanan û paşê projeyên xwe dimeşîne û hwd. Ev tabloya kin a talankirin û wêrankirina xwezayê ya dewleta Tirk û çeteyên wê dimeşînin, ma rewşek xwezayî ye? Bi ser de şerê di navbera Rûsya-Ûkrayna de, şerê di navbera Îsraîl-Hamasê de çiqas çekên jehrî, bombeyên cur bi cur hatin şixulandin, li gelek gund û bajaran kevir li ser kevir nema. Bi ser de rojane xebatên endustriyalîzma moderniteya kapîtalîst ên cur bi cur ne sererd hiştiye, ne jî binerd. Ji bo sedema vê germahiya dijwar wekî van êrîş û kiryarên talankirin û wêrankirina xwezayê mirov dikare vê lîsteyê rêz bike û dawiya wê nayê.
Li hemberî vê rewşa xeter saziyên dilxwede ekolojîst ango jîngehparêz çi dikin? Li gor teoriya kaosê û bandora perperîkê dibêjin, "Li daristanên Amazonan perperîkek dema perê xwe dihejîne, dikare bibe sedema bahozekê ku li nivê dunyayê bigere." Eşkere ye, şerê îro dewleta Tirk û çeteyên wê di Kurdistanê de li hemberî Gerîlayên Azadiya Kurdistanê dimeşînin, bandoreke mezin a xirabkar li ser tevahî xwezayê û mirovahiyê jî dike. Ji bo tespîtkirina van rewşên rojane li ber çavê alemê rû didin, pir pêwîstî bi navendên lêkolînê jî nîn e. Di vê wateyê de pêwîste tu kes li gor propagandayên derewîn ên dewleta Tirk bi navê "şerê li dijî terorê" xwe nexapîne, vê germbûna dijwar a xwezayê normal nebîne û di serî de saziyên ekolojîst, her wisa jin û dayîk bi navê xwedî li jiyan û jîngeha xwe derkevin demildest helwesta pêwîst li hemberî van şerên qirker û faşîst raber bikin.

# Kargeha Lîlît çanda kurdî diparêze

**Tekoşîn Amara/ Qamişlo**

**Jin di hemû warên jiyanê de hebûna xwe diyar dikin. Dizaynera Kargeha Lîlît Nûrhan Abdullah, têkildarî kargeha Lîlît û kar û xebatên ku jin di kargehê de dimeşînin ji rojnameya me re axivî.**

Ger em bixwazin cil û bergên Kurdî di jiyana rojane de were bikaranîn, wek berê zindî bimîne û ji holê nerabe divê bi şêwazê nûjen were parastin û li gorî şert û mercên estetîk û sosyolojiya îroyîn were şêwe kirin. Cil û bergên Kurdî, taybetmendiya vê erdnîgariyê ye û ji aliyê kesên ku li ser vê erdnîgariyê dijîn ve hatiye dîzayn kirin û di dîrokê de cihê xwe girtiye.

**'Cil û bergên çanda Kurdî'**

Nûrhan Abdullah, behsa armanca vekirina kargeha Lîlît kir û wiha got: "Ez li kargeha Lîlît dîzaynera cilan dikim, ez cilan dibirim û jinên din jî didirûn. Nêzî 7 sal in me ev kargeh vekiriye, armanca vekirina me ya kargehê, zindîkirina cil û bergên çanda Kurdî ye. Ji ber ku beriya niha tenê cil û bergên çanda Kurdî di cejna Newrozê û 8'ê Adarê de dihatin lixwekirin, lê di roja me ya îro de Kurd di hemû şahiyên xwe de cil û bergên Kurdî li xwe dikin. Beriya ku em kargeha xwe li bajarê Qamişloyê vekin, me li navçeya Amûdê kargeh vekiribû. Em hem ji bo Kurdan, hem jî ji bo pêkhateyên Suryan û Kurdên Êzidî cilan çêdikin."

**'10 jin di kargehê de dixebitin'**

Nûrhan Abdullah, diyar kir ku" gelek caran cilên ku çêdikin didin bi kirê û li sûkê difiroşin, em dixwazin dest bi projeyek nû bikin û dikanek parçeyên caw lê werin firotin vekin û wiha got: "Di kargehê de em 10 jin kar dikin, 5 ji me karê dirûtinê û 5 jin jî karên destan dikin. Em li vir cil û bergên çanda Kurdî, kiras, qemîs û cilên ku em çêdikin û didin dikanên li bazarê karê dirûtinê. Me projeyek daye pêşiya xwe ku em perçeyên caw ji derve bînin.

**`gelek jin li kargehê fêrê dirûtinê dibin`**

Nûrhan Abdullah got ku" gelek jin dewreyên dirûtinê li cem me dibînin û li gor îmkanên xwe li derve karê dirûtinê dikin. Her wiha ji bona ku her jinek aboriya xwe bi xwe bi dest bixe xwe fêrê dirûtina cilan dike, ji bona ku em biwan re bibin alîkar me dewreyên fêrbûna dirûtinê li ser



asta du meh heyanî sê mehan vekir, dewrê dirûtinê li ser xwesteka kesên ku dixwazin fêrê dirûtinê bibin hatiye vekirin.
Nûrhan Abdullah di dawiya axaftina xwe de got ku: Beriya şoreşa Rojava jinan tu kar nedikir. Lê bi şoreşa Rojava re gelek jinan di nav kar û xebatan de cihê xwe girtin û ez bang li hemû jinan dikim ku bi xwe bawer bin, ji ber ku hêza her jinekî heye û heta ji destê wan tê bila bikevin nav kar û xebatan û aboriya xwe bixwe pêş bixin.



# Jina dengzelal û sazbenda hêvîdar; Hêvyar Hemo

Hêvyar Hemo jineke ciwan xwedî hestekî xweş, dengzelal û sazbendeke jîr ya tembûrê ye ku ji zaroktiya xwe ve mijûlî hunerê bûye. Hêvyar di dema niha de dixwîne û karê rojnamegeriyê dike, hêviya Hêviyar ew e ku vegere qada hunerê û warê zeytûnê.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Stranbêjî, muzîkjenî, li gel xwestek û vîna jinên ciwan, li Rojava heya radeyekê baş tê dîtin, ji van jinên ku mijûlî aliyê hunerê bûne Hêvyar Hemo ye.

**Jiyana Hêvyar**

Hêvyar jineke ciwan e, ji gundê Hisê yê girêdayî navçeya Mabeta ya Efrînê ye, di 22'yê Tîrmeha sala 2004'an de ji dayîk bûye. Ew sitranbêj û sazvaneke kurd e. Refê 1 heya 3'yan li Helebê xwendiye, piştî aloziya Sûriyê destpêkir, vedigere gundê xwe û qonaxa seretayî ji xwendina xwe li wir bi dawî dike. Piştî wê jî diçe mala bavpîrê xwe û xwendina navîn bi destpêkirina êrişên dagirkeriya Tirk li ser Efrînê re bidawî dike. Piştî ku êrişên dagirkeriyê dest pê dike, bi malbata xwe re koçberî Şehbayê dibin. Êdî Hêvyar li xwendina xwe ya amadehî li dibistana gundê Bênê tevî şert û mercên jiyanê û êşa koçberiyê bi dawî dike. Lê tevî êşa koçberiya ji cih û warê xwe, herwiha rewşa zehmet, Hêvyar serkeftin armanca wê bû, lewma jî bawernameya xwendina amadehî ya kurdî bi şaxê zanistî wergirt. Hêviyar di zaroktiya xwe de girêdayî hunerê bû jî, ji wênesaziyê hezdikir, lê bêtirî xwe, wê ji stranbêjiyê û lêdana sazê hez dikir. Ji ber vê yekê jî wê hem girêdayî hunerê bû û hem jî xwendina



xwe didomand. Piştî Hêviyar xwendina amadehî bi dawî kir, berê xwe da Qamişlo ji bo ku beşê Komputer li Zanîngeha Rojava bixwîne. Hêviyar di dema heyî de gihiştiye sala 3'an ji salên xwendina zanîngehê, di heman demê de jî kar û xebata rojnamegeriyê di Rojava TV'iyê de dike.

**Hezkirina wê ji hunerê**

Hunera destpêkê ya ku Hêviyar di qonaxa zaroktiyê de jê hez kir, wênesazî bû, wê dema xwe bi xêzkirn tiştan ve mijûl dikir. Lê dema ku saza di destê bavê xwe de dît, evînek ji wê amûrê re li cemê hat afrandin. Hêjayî gotinê ye ku bavê Hêviyar, tembûrvan e, dema ku Hêvyar refa 8'an dixwend bavê wê kursên fêrkirina amûra tembûrê didan şagirtan. Hêvyar jî bû yek ji şagirtên bavê xwe û bi vîneke xurt dest avêt tembûrê û xwe fêr kir. Hêvyar hin bi hin xwe li pêş xist û pê re jî stran digotin. Dema ku Efrîn hat dagirkirin, ew bi temenê xwe biçûk bû, lê bavê wê helbesteke stranî bi navê Ax Derdê Min li ser Efrînê nivîsand û Hêvyar jî ew helbest bi awaz kir. Piştî ku ew bi malbata xwe re koberî Şehbayê bû, tevlî xebata çand û hunera Şehbayê bû, di piraniya çalakî, şahî û şevbuhêrkên hunerî dibû û stran digotin. Piştî ku hate Qamişlo û dest bi xwendina zanîngehê kir, ji hunerê dûr ket. Xwestek û hêviya Hêvyar ew bû ku beşê muzîkê bixwîne lê ji ber hin sedemên girêdayî malbatê nikarîbû xwesteka xwe pêk bîne. Lê ew gelekî bi hunera stranbêjiyê û tembûrvaniyê ve girêdayî ye bi taybet gotina stranan. Hunrermendê ku Hêvyar jê hez dike û stranên wî dibêje hunermendê nemir, Bêto Can e, wê piraniya stranê Bêto Can ezber kirine û wan dibêje.

**Astengiyên ku derketin pêşiya hunera wê**

Xewna Hêvyar ew bû ku xwendina xwe di warê muzîkê de bidomîne, lê yek ji astengiyên herî mezin ku derketin pêşiya xwena wê, qeydên civak û malbatê yên di derheqê jinê de bûn. Civaka ku Hêvyar di nav de dijiya, stranbêjî jê re nedipejirand, malbata wê jî tenê weke jêhatiyeke takekesî ji Hêvyar re erê dikir. Ango ramana ku Hêvyar bibe hunermendeke berz û asîmanê cîhana jinan ê hunera kurdî bixemilîne, li cem civakê û malbatê nehat qebûlkirin. Ev astengî hişt ku ew ji qada piratîkî ya hunerê dûr bikeve û stranbêjî bibe xewnek. Malbatê xwesteka Hêvyar a ji bo xwendina beşê muzîkê red kir. Êdî dema ku Hêvyar hate Qamişlo û dest bi xwendina zanîngehê kir, hîn bêhtir ji stranbêjiyê dûr ket. Ew niha bi tena xwe li Qamişlo dijî, dixwîne û hem jî kar dike, sedema ku hişt kar bike jî ji ber ku bi tena xwe li vir dijî û rewşa madî jî ne alîkar e. Niha ne tembûr heye û ne demeke vala li cem heye ku rahêje tembûrê.

**Hêvyar bi hêvî ye ku karibe hunera xwe bidomîne û veger Efrînê**

Hêvyar jineke ciwan xwedî dengekî xweş û hestekî nazik e, lê astengiyên ku derketin pêşiya wê bandoreke neyînî li hunera wê kir. Lê hêvî û xwesteka Hêvyar ji hemû astengiyan bi hêztir e, ji ber ku hertim huner, stran û muzîk di arazû, aşop û giyanê wê de dijîn. Herwiha bi hunerê ve hatiye girêdan, di dema karê rojnamegeriyê de de di dilê xwe de stranan dibêje, di kêliyek biçûk ji valahiyê de hestê xwe derbirîn dike. Ew niha bi hemû hêza xwe hewl dide ku stranbêjiyê winda neke ji ber astengiyan û hem jî berxwedaniyeke mezin dike ji bo vê yekê. Hêviya Hêvyar û xwenên wê meşa li ser riya hunerê ye û xwesteka wê rizgarkirna Efrînê ji destê dagirkeriya Tirk û vegera bi rûmet li warê zeytûnê ye.

## Bawerî Yan Rik



**Sîpan Şînda**

Peyv, ango alavên bilêvkirina hest û ramanên mirovan. Dema peyv dilerize, dil diquse, mejî gêj dibe, giyanê mirovî teng dibe. Dema peyv diherike, dil geş dibe, mejî vedibe, giyanê mirovî fireh dibe. Peyv, serdilê pênûsa helbestvanan, dil evîniya dengbêjan, dermanê dilê evîndaran. Peyv, xurttirîn çeka nivîskaran.

Peyv, di jiyana mirovî de weke hilmê, nan û avê ye. Dema mirov bê peyv dimîne, mirov kerr û lal dibe, jiyan li mirovî teng dibe. Di jiyana mirovî de peyv, weke yek ji hîmên ku mirov jiyana xwe pê dide domandine. Gelek peyv hene di jiyana mirovî de mirov bi kar tîne, lê belê mirov ji aliyê watê de li ser wan peyvan nasekine. Lê çawa di jiyanê de her tiştekê navek, wateyek ya xwe heye, her peyvekê jî wateyeke xwe heye. Ji ber wê ye ku peyv dibin berdevkê dil, giyan û mejiyê mirovî. Wata peyvan, ji bo mirov bikaribe derdê dilê xwe baştir, xurttir û herikînertir bêje, girîng e. Gelek peyv hene mirov wata wana baş ji hev dernaxîne. Dema mirov wata wan ji hev dernexe, mirov wana di şûna hevdû de dişixwilîne û ev yek him ji bo kesan him ji bo ziman tengaviyekê dertêxe holê. Du peyvên ku di Kurdî de tên bikaranîn û carna gelek kes vana tevilhev dikin jê bawerî û rik e. Bawerî; girêdana mirovan ya bi tiştinan yan jî kesinan ve ya ji dil e. Mirov dikare bêje ji roja mirovahî heyî heta niha bawerî jî heye. Bawerî, di jiyana mirovan de ji bo wana tiştekа erêniye. Xwediyê baweriyê, ji çi tiştê, ji kesî bawer bike bila bike, ew wê baweriya xwe ji bo xwe û jiyana xwe girîng dibîne. Her çend mirovan di heyamên berê de ji tirsa xwe bawer kiribin jî, lê paşê ev tirs û xof veguheriye lêgerînekê. Gelek caran felaketên mezin di serê mirovahiyê de hatine. Ji ber wê, ji bona mirov xwe ji felaketan biparêzin, heta ji wan hatiye baweriya xwe xurt kirine. Di baweriyê de mirov xwediyê armancekê ye. Bawerî tişteke bi plan e; hêvîyekê, gomanekê dide xwediyê xwe. Bawerî, enerjiyeke erênî dide bawermendan. Mînak, ew kesên bi mehan dikevin di rojiyê de, bê xwarin û vexwarin dimînin, xwediyê baweriyeke bê hempanin. Heke ne ji ber baweriyekê pirr xurt be, mirov nikarin demekê ewqas dirêj bê xwarin û vexwarin bijîn. Lê ew baweriya wan mirovan, wana li ser piyan dihêle. Kesên ku oldarin jî, bi heman baweriyê heta taliya temenê xwe dijîn. Bawerî hêzê dide xwediyê xwe.
Rik; bi kurtasî mirov dikare bêje lingê xwe dana tehtê ye. Ango qebîl nekirin û pêjber derketina daxwazan ya bi tûnd e. Li hember derketina daxwaz, hîvî yan jî qedexeyên hina ne. Çi armanca rikûyîtiyê nîne. Kesên riko dixwazine bi rika xwe, xwe li derdora xwe bidine pejirandin. Xwediyê rikê (eks, inyad), bê armanc û plan e. Rikûyîtî, di jiyana mirovan de tiştekê nerêniye. Ew him xwisarê dide xwediyê xwe û him jî dide derdora wan. Dema yek dibêje, 'ez ji rikê te de nakim', 'li min biye eks', ev tiştên henê her tim di navbera mirovan dibe sedema devjenî û nexweşiyan. Bi taybetî ji di navbera zarok û deybaban de. Bawerî xwediyê xwe pêşve dibe, rik xwediyê xwe vedimirîne.
Bê goman bi hemîkesê re biçek ji be rik heye, lê belê dive mirov rê nede ku rika mirovî serî ji mirovî bistîne û bibe bela serê mirovi.

# Jina ku bi dengê xwe şoreş û evîn gihandî hev: Merziye Ferîqî

**Li ser koça dawî ya hunermenda Kurd Merziye Ferîqî re 18 sal derbaz dibin, lê hîna dengê wê di dil û mejiyê her kesekî de vedide. Hunermenda Kurd Meziye bi deng, awaz û hunera xwe şoreş û evîn gihandibû hev.**

18 sal li ser koça dawî ya hunermenda Kurd Merziye Ferîqî re derbaz dibin, lê hîna dengê wê di dil û mejiyê her kesekî de vedide.

**Merziye kiye?**

Merziye Ferîqî ango Merziye Şehab Ebdula, di sala 1958'an de li bajarê Merîwan ê Rojhilatê Kurdistanê ji dayîk bû. Li heman bajarî xwendina xwe ya seretayî û navîn qedandiye. Di temenê xwe yê 9 salî de heskirina wê ya ji bo stran û şanoyê çêdibe. Gelek caran di çalakiyên dibistanan de tevlî beşên hûnerî yên weke şano û stranan bûye.
Merziye destpêkê bi sitranên Fetanî Welîd bi zimanê Farisî dest bi sitranbêjiyê kir. Lê zulm û zordariya dewleta desthilatdar a Îranê ya li ser hûnera Kurdî, bandorek li ser Merziye kir û dest ji sitranbêjiya zimanê Farisî berda. Merziye dest bi sitranên Kurdî kir.
Hûnermenda Kurd Merziye piştî xwendina seretayî di sala 1970'an de diçe bajarê Sine û xwendina xwe ya Amadeyî di beşa mamostatiyê de li wir temam dike. Piştî temamkirina xwendina xwe wek mamosta li gundekî nêzîkî bajarê Merîwan dest bi kar dike. Di sala 1977'an de bi koma muzîkê ya bajarê Sine re gelek caran derdikeve ser dikê û sitranan dibêje. Piştî wê 2 salan dîsa vegeriya Sine û bû mamostaya dibistana seretayî.
Hûnermenda Kurd di temenê xwe yê 21 salî de ango di sala 1978'an de bi hûnermendê Kurd ê navûdeng Nasir Rezazî re dizewice. Herdû hûnermend ji ber beşdarbûna wan a ji raperîna şoreşa gelên Îranê, dikevin bin çavdêriya Komara îslamî de. Merziye bi Nasir Rezazî re xebata xwe ya ji bo rizgariya Kurdistanê dewam dike. Merziye demek hat girtin û piştre jî mafê mamostatiyê jê hat wergirtin.
Di sala 1980'an de Komara Îslamî hemû bajarên Rojhilatê Kurdistanê xist bin kontrola xwe de. Merziye jî ji ber êrîşên Komarê nekarî di nava bajêr de bimêne. Ji bo vê bû pêşmerge û li çiyayên Kurdistanê li gel rêhevalê jiyana xwe Nasir Rezazî bi Komeleya Şoreşgerên Zehmetkêşên Kurdistana Îranê re xebata xwe dewam kir.
Merziye di çiyayan de jî karê xwe yê hûneriyê dewam kir, li wê derê hinek sitran qeyd kir. Di çiya de herwiha sirûdên nîştîman û hinek sitranên din yên şoreşgerî qeyd kirin.
Wê demê bi rêya radyoyan dengê hûnermenda Kurd belav bû û gihişt guhê hemû Kurdan. Yekemîn karê Merziye yê li çiyayan bi Koma Banga Komale re çêkir ku ew jî sirûda bi navê "Pêşmerge" bû ku di nava pêşmerge, gel û radyoyên Kurdî de bi nav û deng bû.
Hûnermenda Kurd dayîka sê zarokan bû. Zêdetirî sitranên Merziye li ser hestên nîştimanperweriyê bû. Merziye li ser evîndariyê jî sitran gotin, heya niha sitran û berhemên Merziye di nava Kurdan de dimîne û ketiye dilê wan de.
Merziye piştî şoreşa Îranê bi malbata xwe re wek penaber di sala 1985'an de derbasî Swêdê bû û li wê derê xebat, tekoşîn û xizmetê ji bo hunera Kurdî kir.
Merziye yek ji hunermendên jin ên ku di stranên xwe de xemên xwe yên derbarê jinan de û her wiha zordestî



û çewisandinên li ser jinan aniya ziman. Li dijî pergala baviksalarî ya paşverû û kevneşopiyên kevneperest ên civaka Kurd derket û ji bo ramana hevpar a civakê serî hilda.
Merziye di stranbêjiyê de xwedî jêhatîbûneke mezin bû, wê pir baş bi awaz û gotinên mûzîkê bi ahengek bê hempa dileyîzî.
Wek hunermendek xwedî tecrûbe, estetîk û hunermendek bi cilûbergên Kurdî her tim boneyên netewî û cuda xwe dixemiland.
Hunermenda Kurd Merziye Ferîqî di temenê xwe yê 47 salî de, di 18'ê Îlona 2005'an de li nexweşxaneya Swêdê bi nexweşiya dil koça dawî kir. Li ser wesyeta wê cenazeyê Merziye anîn Başûrê Kurdistanê û li Girê Şehîdan ê li Silêmaniyê spartin axê.

# Bexçeyê Azadî bûye cihê rehetiya gel ya derûnî

Rêveberê bexçeyê Azadî Elî Elî diyar kir ku bexçeyê Azadî bûye cihê rehetiya gel ya deronî û wiha got: "Em bi hêvî ne ku gelê me bibe alîkar û ekolojiya bajêr biparêzin, ji ber ku xweza û ekolojî bingeha jiyana mirove."

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Di 1`ê Mijdara 2022`an pirojeya avakirina bexçeyê Azadî hat destpêkirin, her wiha di sal û mehekê de gulîstan ji hemû aliyan ve hat hazirkirin û vekirina wê kete rojeke taybet ji bo tevahiya gelên herêmê. Di roja 27'ê Mijdarê, salvegera damezrandina Partiya Karkerên Kurdistanê PKK'ê de gulîstan hat vekirin û navê Azadî lê hat kirin. Bexçeyê Azadî di nava xwe de stadiyûmên fotbool, basketbol, voleybol, avjenîgeh û hola werzîşê ya bedenî, dihewîne. Di bexçeyê Azadî de gelek beş hene ew jî wiha ne;Beşê sporê, beşê vesihandin, beşê çalakiyan, beşê rêveberiyê, beşê ewlekariyê, beşê çandiniyê û beşê darayî.
Derbarê bexçeyê Azadî de, rêveberê wê Elî Elî ji Rojnemeya me re axivî.



### Pirojeya avakirina bexçeyê Azadî

Elî Elî balkişand ser fikira avakirina bexçeyê Azadî û wiha got: "Di destpêkê de fikra avakirinê tenê stadyûmên lîstikên werzîşê yên cûr bi cûr bû. Armanca vê pirojê ew bû ku em ciwanên di kolanan de û ne bi rêxistin kirî ne, kombikin, fêrî tiştên baş bibin û bên birêxstinkirin. Lê me pêwîstî dît ku em gulîsaneke mizin ava bikin û bibe cihê kef, behinvedan û rehetiyê ji gel re. Li ser vê bingehê me ji 1`ê Mijdara 2022`an de pirojeya avakirina bexçeyê Azadî da destpêkirin. Di destpêka pirojeyê de, bingeh jêre hat dayîn, êdî dar hatin çandin, pirojeyê dewam kir û di dema avakirinê de ti pirsgirêk derneketin. Her wiha di sal û mehekê de gulîstan ji hemû aliyan ve hat hazirkirin û di 27 Mijdara 2023'an de, di rojeke taybet de hat vekirin, ew roj jî salvegera damezrandina Partiya Karkerên Kurdistanê PKK`ê bû. Navê azadî lê hat kirin û ev gav ji bo gel bû cihê kêfxweşiyeke mezin."

### Beşên bexçeyê Azadî

-Beşê sporê: Stadiyûmên fotbool, basketbol, voleybol, avjenîgeh û hola werzîşê ya bedenî.
-Beşê Terfîhî: Ev beş cihê bihinvedanê û rehetiyê ye, leystok ji bo zarok û mezinan hene, dar û cihê rûniştinê hene da ku malbat li hev kom bibin û rojekî xweş bi hevre derbas bikin. her wiha xwaringiha Qamişlo di hindirê gulîsana Azadî de heye , lê ew xwaringeh teslîmî kesekî hatiye kirin, yanî kirê, di bin sîwan û sîstema bexçeyê Azadî de tevdigere.
-Beşê çalakiyan: Dikeya şahiyan jî di hidirê bexçeyê Azadî heye ku her bîranînek yan jî şahiyên ji bo rojên taybet li wir tê li dar xistin, her wiha berê cihekî taybet ji bo şahiyan tune bûn, lê niha ev dikeya bexçeyê Azadî ji bo her şahiyekiyan e û di heman demê de gel bi coşekî mezin tevlî dibin.
-Beşê Rêveberiyê: Di hindirê bexçeyê Azadî de nêzî 90 kes hene ku parastina wê dikin ji aliyê paqijiyê de yan jî tevger û displînê ve, êdî bexçeyê Azadî ji bo gelek kesan bû alîkar da ku kar bikin û debare jiyana xwe bikin. Her wiha beşê Rêveberiyê, dîwan, maliyê, xweser, arşîf û 2 kes jî bi taybet li ser beşê werzîşê disekinin û birêvedibin, niha jî 4 dibistanên gokê eqid bi stadiyûma Azadî re çêkirine da ku zarokan perwerde bikin.
-Beşê Ewlekariyê: Bexçeyê Azadî bi ferehî û mezinbûna xwe tê nasîn û di heman demê de gel jî pir lê kom dibin, ji ber vê yekê beşê ewlekariyê girînge. Armanca sereke ji bexçeyê Azadî ne qezenceke madî ye, lê belê ji bo parastina xweşikbûn û xwezayê ye. Eger ewlekarî di gulîstanê de nebe wê gelek pirsgirêk û bandorkirina li ser ekolojiyê were kirin. Lê bi avakirina girûpên ewlekariyê gel bi baldarî xwe bi rêxistin dikin. Ew bi xwe parastina derdora xwe dikin. Di heman demê de beşê paqijiyê jî di hundirê bexçeyê Azadî de heye. Ew bi erkê paqijiya gulîstanê radibin û dihêlin ku kesên li gulîstanê jî li ser paqijyê balder bin.
- Beşê Çandiniyê: Ji bo çandina daran û gulan, di heman demê de ji parastina xwazayî, komek ji pesporên çandiniyê hene, ew jî bi dar û gulên di gulîstanê de mijul dibin, heta niha gelek darên fêkiyan hatine çandin û di demên pêş de wê gel fêkiyan di bexçeyê Azadî bixwe.
-Beşê darayî: Di gulîstanekê wiha mezin de ku di hindirê wê de lîstok, xwaringeh û dikan hene, wê demê kirîn wê were çêkirin, lê bihayên wê ne di wê asta bilind de ne, li gor gel hatiye dayîn. Mînek her kertek yên lîstokan nirxê wê 5 hezar lêriyên surî ne. Her wiha ev pere jî vedigre gulîstanê, ji ber ku gelek parastin jê re pêwîste û her heftî amûrên ku xirab dibin, bi van pereyan tên çeksazkirin.

### Astengî û zehmetî

Elî balkişand ser zehmetî û astengiyên ku li gulîstanê derdikevin, herwiha çareseriya wê û wiha got: "Di milê kontolkirina hin xortan de em zehmetiyê dikşînin, ji ber vê yekê em hewl didin ku em van pirsgirêkan çareser bikin û emê di demekê nîz de bendê kontirolkirinê li ser riya bexçeyê azadî deynin. Di heman demê de runiştina li ser riya bexçeyê Azadî wê were qedexekirin, ji ber ne taybetmendiyeke raste."

### Parastina îkolojîk girînge

Rêveberê gulstana Azadî Elî Elî di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Beşek ji bexçeyê Azadî hîn ne hatiya avakirin, her wiha gelek pêşinyarî hene, lê pêşinyare ku herî zêde me girîngî dayê de Mole, me dixwest ku em Molekî mezin di hindirê bexçeyê Azadî de avabikin da ku gel were hem behinvedanê û kêfê û di heman demê de were Molê tiştên pêwîst bikirin. Her wiha em bi hêvî ne ku gelê me bi me re bibe alîkar û îkolojiya bajêr biparêzin, ji ber ku xweza û îkolojî bingiha jiyane mirove."



## Nijadperestî û îslam

**Hafiz Ahmet Turhalli**

Piştî koça dawî ya Pêxember SXL, Îslam ji bo desthilatê hêdî hêdî hate bikar anîn û ola Îslamê ji meqseda xwe ya bingehîn hate dûrxistin. Di serdema Emewiyan de Îslam ji bo nîjadperestiya erebkirinê hate bikar anîn. Hêla Îslamê ya gerdûnî weke dagirkirinê hate bikar anîn. Lê ev dagirkirin di heman demê de ji bo erebkirina gelan hate pêşxistin. Weke mînak kê Erebî nizanibe nikare bibe oldarekî baş, zimanê Erebî zimanê cinetêye û hwd.
Ev jehra nijadperestiyê weke ola îslamê bi destê desthilatan hate belav kirin.
Îslam pirsgirêka nijadperestiyê weke nexweşî digre dest û hemû mirovan weke hev pênase dike.Tenê li ba Xwedê ew kes xwedan qedir û qîmete ku berpirsiyar tevdigere û berpirsiyariyên xwe bi cîh tîne. Xweda di Sureya Hucurattê de weha dibêje:"Gelî Bawermendan! Bila civakekê bi civakekê dîtir tinazên (laqirdê) xwe neke; dibe ku ew civak ji wan çêtir û baştirbe." (Hucurat 11)"Gelî Mirovan! Bê guman me we ji nêr û mêyekî afirand, ji bo hûn hevdû binasin, me wergerand ji Eşîr û Gelan. Li ba Xwedê kesê herî qedirbilind, Kesê/kesa li beramber Xwedê berpirsiyariyên xwe pêk tîne eweye. Xwedê her tiştî bi heqqîyê dizane û ji her tiştî agahdare. (Hucurat 13)
Pêxemberê me weha gotiye: "Kesê banga nijadperrestiyê bike ew ne ji meye. Kesê ji bo nijadperestiyê şer bike ew ne ji meye. Kesê ji bo nijadperestiyê were kuştin ew ne ji meye."( Ebu Dawud, edeb, 111-112)
Ji Pêxember hate pirsîn nijadperestî çiye? Got: " Qewmê te zalimbe û tû piştgiriya wî bikî."
Dema mirov van ayetan û Hedîsan dixwîne û kiryarên kesên ji xwere dibêjin em Misilmanin dinêre, mirov matmayî dimîne. Di pêşbirka Goka Îsal ya Ewrupayê de, yek ji listikvanên tîma Gokê Îşareta Gur ku nijadperestiya Tirkan pênase dike, nîşan kir û ser wê gengeşî hatin pêşxistin. Divê neyê ji bîr kirin, ev nîşaneya Gur buye sedema kuştina sedhezaran mirovî! Kê çê zilm, dizî, tecawûz, kuştin û tiştên ne li rê kirine bi nijadperestiya Tirk xwe xemilandiye. Kesê li Almanya ev Îşareta nîjadperestiyê pêkanî lê ceza hate birîn. Ew kes bixwe jî weke nijad ne Tirk e! Ji Mela û Şêxên dewletê bigre heta sîyasetmedarên wî ji bo vê cezayê xwe perçe kirin. Çawa nijadperestiya me tê ceza kirin. Hemû kesên li Tirkiyê dijîn va îşareta nijadperestiya Tirkan bixweve kirin û gotin em Tirkin serbilindin. Heyf û mixabin kesê vê sosreta han pêk tînin, piraniya xwe jî, weke nijad ne Tirkin. Erdogan ji bo vê buyerê çû Berlînê. Ji bo doza Kurdî heta êvarê Meleyên wan, Şêxên wan, Alim û zanayên wan bang dikin dibêjin nijadperestî herame!
Gelo Kurdê hêjar ku zimanê wî, çanda wî, dîroka wî û ola wî hatiye qedexe kirin, doza van tiştên xwe yên fitrî xwezayî bike herame? Mixabin îro gelek kesên jixwere dibêjin em Misilmanin, Kurdan weke nijadperest û Kafir dibînin. Ew dînê Xwedê nas nakin, Dînê dewletê dihebînin. Pêxemberê me SXL negotibû, nijadpersestî dema Qewmê te zilmê bike û tû piştgiriya wî bikî tu nijadperestî!
Dînê Xwedê û Pêxemberê wî Hz Muhemmed SXL ji holê hatiye rakirin, şûna wî dînê dewletê hatiye bi cîh kirin. Kesê /Kesa qaşo di nava civakên bi navê Misilman yên Tirk li Tirkiyê dijî, nijadperest e, û Pêxember jî dibêje nijadperest ne ji mene? Gelo Hûn ji kîjan Pêxemberî bawer dikin.

# Qehwexaneya Kewê yek ji kevneşopiyên Amûdê ye

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Qehwexaneya Kewê ya Amûdê taybetmendiyeke wê ya cûda ji qehwexaneyên din heye, ev qehwexane avahiyeke ku bi heriyê di sala 1954`an de ji aliyê Mihemedê Kewê ve hatiye avakirin û heya niha ji aliyê kurê wî ve tê parastin. Ebdulqadir kurê Mihemedê Kewê diyar kir ku Qehwexane yek ji kevnareyên civaka Amûdê ye.

Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê gelek qehwexane hatine avakirin, her qehwexaneyek taybetmendiyeke wê ya cûda heye û yê bêtir berê xwe didin van qehwexaneyan kal û ciwanin. Her mirov ji bo bêhnvedan û dîtina dos û hevalên xwe berê xwe didin qehwexaneyan. Di heman demê de yek ji kevneşopiyên civakê yên herêmê rûniştina mêran li qehwexaneyê û yek ji qehwexaneyên navdar Qehwexaneya Kewê ya bajarê Amûdê ye.



Ebdulqadir Kewê

### Qehwexaneya Kewê cihê vegotina çîrokan e

Qehwexaneya Kewê bala her mirovekî ku li pêşiya wê dimeşa dikşîne, ji ber avahiyeke kevne, ji herî, text, deriyên hesinî û pencereyên textî hatiye avakirin. Ev qehwexane ji aliyê Mihemed Kewê ve hatiye avakirin. Beriya ku Mihemed vê qehwexaneyê ava bike, cihê 2 dikanên biçûk yên ji herî bû, lê kewê ev veguherand qehwexane û mezin kir. Niha ev qehwexane ne tenê li bajarê Amûdê navdare lê li herêmê giştî bi cihê kevnar e tê naskirin. Di heman demê de Qehwexaneya Kewê ji qehwexaneyên gelêrî yê mîrasî ye. Dîroka avakirina qehwexaneyê heta sala 1954`an diçe. Lê Qehwexaneya Kewê piranî mêrên bi temen mezin dema xwe axaftin û lîstina bi kaxezan derbas dikin, an jî çîrokan vedibêjin.

### Xweşbûna Qehwexaneyê Kewê neguhertina şêwazê wê ye



Ferhan Emikê

Cihê rûniştina mêvanên qehwexaneyê di havîn û zivistanê de tê guhartin. Di havîn de cihê rûniştinê li parka qehwexaneyê ye û di zivistanê de ode heye. Mase û kursiyên biçûk ên ji text hatine çêkirin hatin raxistin, lê niha ji hesin in. Herwiha cudabûn û xweşbûna vê qehwexaneyê ew e ku ji dema avakirina qehwexane û heta niha ve tu tişt jê nehatiye guhartin. Qehwexaneya Kewê yek ji kevnareyên civaka bajarê Amûdê ye.
Derbarê Qehwexaneya Kewê ya bajarê Amûdê de xwediyê Qehwexaneyê Ebdulqadir Kewê ji rojnameya me re axivî. Ebdulqadir kurê Mihemedê Kewê diyar kir ku ev nêzî 70 salî ev qehwexane hatiye avakirin û wiha got: "Di bajarê Amûdê de ev qehwexane navdare û kevnare, her wiha ji bajarê Amûdê re bûye dîrokek. Tevî di van salên dûr û dirêj yên avabûna wê de gelek qehwexaneyên nû bi rengê nû hatine avakirin, lê em qehwexaneya xwe naguherin ji ber xweşbûna wê di vê şêwazê wê de ye. Qehwexaneya Kewê cihê rehetiya kal û ciwana ye, kal û ciwan di hundirê qehwexaneyê de qehwê, çayê, zihurat, niskafê û kemûn vedixun, him jî bi kaxezan dilîzin.

### 'Em ê kevnareya bavê xwe biparêzin'

Ebdulqadir Kewê axaftina xwe wiha qedand: "Niha di qehwexaneyê birayê min û kurê min bi min re kar dikin. Navlêkirina qehwexaneyê bi navê Kewê ew ku navê dapîra me Kewê bû. Astengiyên ku em dibînin ew ku gaz û elektirîk peyda nabe. Lê bi her rengî em ê vê kevnareya bavê xwe biparêzin."

### 'Dîroka bav û kalên me bi bîr tên'

Di heman mijarê de Mêvanekî qehwexaneyê yê bi navê Ferhan Emikê diyar kir ku ev qehwexane ji bo wî cihê rehtiyê ye û wiha got: "Em rojane berê xwe didin vê qehwexaneyê ji ber ev qehwexane ne mîha hemû qehwexaneya ne, di vê qehwexaneyê de dîroka bav û kalên me bi bîr tên."



# 'Rewşa Sûriyê derfetê nade ku Esed û Erdogan bicivin'

Sekretêrê Partiya Çepa Demokrat a Kurd li Sûriyê Salih Gedo anî ser ziman ku rewşa Sûriyê û kiriyarên dagirkeriyê derfetê nadin Beşar Elesed bi Erdogan re bicive. Herwiha Gedo da zanîn ku Rêbeberiya Xwser hîmê bingehîn ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê ye.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Aloziya Sûriyê di navbera hewldanên Rêveberiya Xweser ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê û reva hikumeta Şamê ji çareseriyê bo hêzên derve, her ku diçe kûrtir dibe.
Hikumeta Sûriyê di dema dawî de êdî ber bi hevdîtineke bi Erdogan re ye, têkildarî heman mijarê Sekretêrê Partiya Çepa Demokrat a Kurd li Sûriyê Salih Gedo bersiva pirsê rojnameya me dan û hevpeyvîn wiha bû:

**-Ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê, gelek civîn û hevdîtinên li ser asta herêmî pêk hatin, herî dawî hewldan hene ku Erdogan bi nabênkariya Rûsî, bi Beşar Elesed re bicive, hûn vê yekê çawa dinerxînin?**

Wekî em dizanin kirîza Sûriyê dikeve sala xwe ya 14`yan, jiyana gelên Sûriyê bi giştî di encana destpêkirina kirîzê de hate guhertin. Ji xwe diyar e ku çiqas kuştin, talankirin, koçberkirin li Sûriyê çêbû. Serjimarî dest nîşan dikin ku bi 100 hezaran canê xwe ji dest dan, bi melyonan koçber bûn û bi hezaran di girtîgehan de ne. Tişta herî xerab ew e ku beşek ji xaka Sûriyê ji aliyê Tirkiyê ve hate dagirkirin. Bi rastî destdirêjahiya ku ji alyê hêzên navdewletî a ku li ser gelên Sûriyê pêk hat pir dijwar bû, bi taybet destdrêjahiya dewleta Tirk. Ji destpêka vê kirîzê heya niha gelek civîn ji bo bidawîkirina kirîza Sûriyê hatine lidarxistin. Lê hîna jî kiryarên xerab yên ku li dijî gelên Sûriyê tên pêkanîn berdewam in û her ku diçe kirîza Sûriyê aloztir û kûrtir dibe. Erdogan ew bû yê ku kirîza Sûriyê aloztir kir û destek da DAIŞ'ê û tevahiya komên çete yên din. Di dema dawî de em dibînin ku Erdogan yê ku biryara dagirkirina xaka Sûriyê da û komên çete hembêz kir, hewl dide civîneke sêalî bi Beşar Elesed û Potên re li dar bixe. Piştî ku Erdogan di hilbijartinên xwe yên dawîn de bi bin ket, êdî siyaseta wî ya derve û partiya wî di Tirkiyê de bêbandor ma. Piştî ku Erdogan û partiya xwe şikestin, di roja îro de Erdogan bi riya civîneke sêalî de dest bi lîstikeke nû û xirab dike. Armanc ji vê civînê ew e ku kirîza di hundirê Tirkiyê de sivktir bike û Rêveberiya Xweser û QSD'ê hedef bigire, hem jî gelê kurd tune bike. Niha Erdogan hewldanên xwe dike, lê texmîn nayê kirin ku ev civîn pêk were û Esed bi serokkomarê dewletekê re bicive ku bi sedema wî beşek ji xaka Sûriyê hatiye dagirkirin. Bi taybet di vê dema hestiyar ku hîn dewleta Tirk guhertina demografîk li ser xaka Sûriyê dide pêkanîn û hemû cureyên kiriyarên xirab di derheqê gelê Sûriyê de dike. Ji ber vê yekê jî rewşa Sûriyê û tiştê ku dibe derfetê nade ku Beşar Elesed bi Erdogan re bicive.





**-Rêveberiya Xweser gelek hewldanên xwe ji bo pêkanîna civînan bi hikumeta Şamê re kirin, armanc ji van hewldan û hevdîtinan çareserkirina kirîza Sûriyê bû, hikumeta Şamê jî hertim ji van hevdîtinan direviya û hîna jî wiha ye, gelo sedem çi ye?**

Bê guman Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji destpêka ku hatiye damezrandin û heta niha ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê gelek hewildan kirine. Di heman demê de diyaloga ji bo bidawîkirina kirîzê bi hikumeta Şamê re ranewestiyaye. Lê heya niha tu helwesteke rast û erênî ji aliyê hikumeta Şamê ve nehatiye kirin. Herwiha vê hikumetê bi hişmendiyeke vekirî û demokrat danûstandin nekiriye, lê belê ew li ser hişmendiya desthilatdariya berî salên 2011'an dimeşe. Bi vî rengî tê xuyakirin ku aliyên şofînî keleman ji bo pêkanîna diyaloga di navbera Rêveberiya Xweser û hikumeta Şamê de datînin û naxwazin kirîza Sûriyê bi dawî bibe. Li ser vê hişmendiyê tu caran kirîza Sûriyê bidawî nabe, lewma pêwîste hikumeta Şamê hişmendiya şofînî rake û biguherîne. Rêveberiya Xweser herdem ji aliyê xwe ve dide xuyakirin ku deriyê wê ji diyalogê re vekrî ye û wê çareserî bi danûstendinên sûrî-sûrî pêk were. Gelên Sûriyê jî bi erênî li hewldanên Rêveberiya Xweser dinerin û hêviyên wan hene ku çareseriyek ji vê kirîza ku her diçe kûrtir dibe, bi riya diyalogê re were dîtin.

**-Li gorî dîtinên we sînariyoyên ji bo pêşeroja Sûriyê û çareserkirina kirîzê çi ne?**

Riya çareserkirina kirîza Sûriyê, mijareke girêdayî gelên wê bi xwe ye. Tiştekî tekez e ku çareserkirina kirîza Sûriyê wê bi dawî nebe heya ku gelên Sûriyê li hev necivin û diyalogekê li dar nexin. Di heman demê de pêwîste ku hemû aliyên siyasî û niştîmanî û kesayetên welatparêz beşdarî diyaloga sûrî-sûrî bibin. Heriwha pirsgirêka gelên Sûriyê were nîqaşkirin, di serî de doza gelê kurd û hemû pêkhateyên din. Hebûna Rêveberiya Xweser di diyaloga sûrî de mercekî bingehîn, bila cîhan tev bizanibe, bêyî Rêveberiya Xweser kirîza Sûriyê çareser nabe. Ji ber ku Rêveberiya Xweser xwedî roleke bingehîn ne ji bo parastin û rizgarkirina axa Sûriyê. Divê neyê jibîrkirin ku hêzên QSD'ê herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê rizgarkirin, ew bûn yên ku karîbûn çeteyên DAIŞ'ê bişkînin û gelên herêmê biparêzin. Rêveberiya Xweser bedelên pir giran di ber parastina vê herêmê de dan, wekî em dizanin bi hezaran şehîd û birîndar ji bo şoreşê dan. Lewma jî Rêveberiya Xweser bingeha çareseriya kirîza Sûriyê ye.

# KCDK-E: Li dijî dagirkerî, xiyanet û qirkirinê rabin!

**Navenda Nûçeyan**

**KCDK-E'yê li dijî êrişên topyekûn ên dewleta Tirk a dagirker û xiyaneta hevkar a PDK'ê banga berxwedana topyekûn kir.**

Di daxuyaniya nivîskî ya Kongreya Civakên Demokratîk a Kurdên li Ewropa (KCDK-E) de wiha hate gotin: "Em bang li gelê xwe dikin ku li dijî êrişên dagirkeriyê yên dewleta Tirk a qirker a li ser Başûrê Kurdistanê, Şengal û qadên gerîla seferber bibin û li her derê çalakiyên protestoyî lidar bixin."
Di daxuyaniyê de ev tişt hatin gotin:
"Tifaqa faşîst a AKP-MHP'ê ku di êrişên topyekûn ên îmhayê yên li ser gelê Kurd de bi ser neket, ji bo tunekirina hemû destkeftiyên gelê Kurd di şer de israr dike.
Dewleta Tirk a qirker bi şirîkatiya hêzên hevkar û dewletên herêmê ev şer gihand qonaxeke nû. Ji





bo vê yekê hemû hewldanên provakasyonê û derfet tên bikaranîn. Di van êrişan de ku bi piştgiriya tam a PDK'ê tê kirin, destkeftî û azadiya gelê Kurd tê hedefgirtin.
Başûr û Şengal di bin gefeke cidî de ne. Dewleta Tirk dixwaze Başûr û Şengalê dagir û îlhaq bike û weke li Efrînê ji qirkirinê re derbas bike. PDK weke milê kêlek a dewleta Tirk dixebite, ji dagirkeriyê re zemîn amade dike û ji bo vê yekê hemû derfetên xwe seferber kiriye.
Sewqiyata leşkerî ya giran ku li Başûrê Kurdistanê tê kirin, bi piştgiriya PDK'ê dewam dike. PDK'ê rêyên fermî ji artêşa Tirk a dagirker re vekir û kontrol bi temamî ji artêşa Tirk re hiştiye. Dewleta Tirk bi berfirehkirina êrişên dagirkeriyê, dixwaze îdareya Başûrê Kurdistanê bixe bin destê xwe.
Hikûmeta Iraqê li şûna ku li hember ferzkirinên dewleta Tirk helwesteke bigire, tevlî polîtîkayên dagirkerî û qirkirinê yên dewleta Tirk bûye. Ev hevkarî ku gef li pêşeroja gelê Kurdistanê jî dixwe, gefeke cidî ku ne di berjewendiyên gelên Iraqê deye.
Tevgera Azadiya Kurd zêdeyî 40 sal e ji bo pêşeroja azad a gelê me têkoşîneke mafdar û rewa dide. Ya ku hedef tê girtin destkeftiyên gelê Kurdistanê û hemû nirxên Kurdistanê ne. Pêşeroja me, xaka me û dîroka me di hedefa êrişan de ne. Li şûna pêşerojeke azad, asîmîlasyon û qirkirin li ser gelê Kurd dimeşînin.
Ji bo ku ev êriş bên têkbirin û gelê Kurd di nava şert û mercên azad de bijî, divê hemû gelê welatparêz ên Kurdistanê di ferqa talûkeyê de bin û bi xwedîderketinek zelal û bihêz li dijî êrişan rabin. Tenê bi vî rengî êrişên dagirkerî û qirkirinê dikarin bên têkbirin. Tenê bi vî rengî dikarin xaka ku bi hezaran kes canê xwe di oxira wê de dane, biparêzin.
Divê gelê me bizanebûna encamên gefa ku zêde dibe biafirîne, li her derê bertekên xwe yên demokratîk raber bike û bi awayekî xurt li dijî dagirkerî, xiyanet û qirkirinê rabe. Divê em bertek û helwesta xwe ya li dijî dagirkeriyê li her derê û li derveyî welat li qadan biqîrin. Em li dijî êrişên topyekûn û xiyaneta hevkar banga berxwedana topyekûn dikin.
Li ser vê bingehê divê em hemû çalakiyên girseyî yên ku li Ewropayê di dawiya hefteyê de hatiye plankirin, bikin wesîleya protestoyan, her tim di nava çalakiyan de bin û li dijî qirkirina dewleta Tirk rabin.''

# ‘Pêwîste her kes bi Rêveberiya Xweser û QSD`ê re bibe yek dest’

Endama Partiya Yekîtya Demokiratîk Arîfa Bekir diyar kir ku pêwîste êdî gelên li herêmên dagirkirî jiyana koletî û zorê qebûl nekin ku daxwaza xeta demukiratîk a Rêveberiya xweser bikin û bi hêzên QSD`ê re bibin yek, ji ber ku tenê ev riya çareseriyê ye.

**Avêste Menaf/Qamişlo**

Ji destpêka aloziya Sûriyê ve, dewleta Tirk ji tevahiya cîhanê çeteyên tûndrew kom kirin û derbasî axa Sûriyê kir. Erdogan xwest bi vê yekê Sûriyê bi giştî di riya çeteyan de dagir bike û gelên resen qir bike. Lê piştî têkçûna çeteyên girêdayî dagirkeriya Tirk, Tirkiyê bi xwe êriş kir û artêşa xwe derbasî axa Sûriyê kir, her wiha gelek herêmên Sûriyê dagir kir. Piştî derbasbûna 13 salan û qedandina berjewndiyên wê, Tirkiyê di dema niha de dixwaze çeteyan bi riya bazarê radestî hikumeta Şamê bike û bi hikumeta Şamê re têkilyan ji nû ve ava bike. Di vê çarçoveyê de Endama Partiya Yekîtiya Demokiratîk PYD'ê Arîfa Bekir ji Rojnameya me re axivî.



Arîfa Bekir axivî û wiha got: “Ji destpêka şoreşa Rojava û heya roja îro alozî û rewşekî pir giran li ser gel tê meşandin, bi taybet li herêmên dagirkirî wek Efrîn, Serê Kaniyê, Girê Sipî, Ezaz û Bab heya roja me ya îro zerarekî pir mezin li ser wan tê kirin. Her wiha em dibînin ku çawa gel ji herêm û warê xwe bi darê zorê rastî koçberkirin, revandin, tecawizkirin û kuştinê jî tên. Di heman demê de gelek sozên dewleta Tirk a dagirker ji van hêzên dijber re hebûn û her dixwest tevlîhevî di nava suriyê de çêbike. Ji ber vê yekê ji 2011`an ve û heya roja îro şoreşa Rojava û tevahî suriyê rastî gelek êşan hat. Şoreşa Rojava şoreşa gel e, her wiha gel pê rabû ji ber ku xwestekên wan hebûn û ji bo sîstemeke Demokiratîk rabûn ser piyan. Wekî ku me anî ziman dewleta Tirk a dagirker sozek dabû van hêzên dijber û çeteyan ku piştgiriya wan bike. Lî ev hemû xapandin bû, ji bo berjewandiyên xwe ew bi karanîn.”

**Li herêmên dagirkirî tevlîhevî zêde dibin**

Arîfa di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Em dibînin ku di vê dema dawî de ku dewleta tirk a dagirker dixwaze lihvkirina xwe bi hikumeta Şamê re bîne û planên xwe yên nû pêk bîne, her wiha lihevkirina dewleta Titk a dagirker bi hikumeta Şamê re hat kirin ku dewleta dagirker a Tirk ji herêmên dagirkirî vekişe û ji Suriyê derkeve. Ji ber vê yekê tevlîheviyek pir mezin di navbera hêzên dijber û Tirkiyê de li herêmên dagirkirî çêbû. Hêzên dijber dibêjin: “Erdogan em firotin” ji ber vê yekê neqebûl kirin û nerazîbûnek mezin ji vê biryarê re hat kirin. Êdî li herêmên dagirkereî serhildan hat destpêkirin, çete hemû rabûn li ser piyan û li hemberî Tirkiyê rawistiyan. Her wiha dewleta Tirk û çeteyên wê li Efrînê pir sûcên dijmirovî pêk anîn, herêm talan kirin û şewitandina dar û daristanan, revandin, dizî û kuştin. Yanê kiryarên li dijî mirovahiyê li wan herêman pêk anîn.”

**Bêdengiya dewletên Navnetewî**

Arîfa Bekir bal kişand ser wê yekê ku di demeke nêz de serweriya dewleta Tirk a dagirker û çeteyên bi dawî bibin û wiha got: “Ji sala 2011`an ve, dewleta Tirk a dagirker û kiryarên wê yên dijmirovî û bê axlaqî ku gelek sûc di herêmên dagirkirî de pêk anî û derveyî zagonên navnetewî ne. Her wiha ev kiryar li ber çavê hemû cîhanê têne kirin û bêdengiya rêxistinên navnetewî dide xuyakirin ku ev sûcên dewleta Tirk rawa û qebûl dike, ji ber ku kesên çavê xwe ji van sûc û kiryaran bigire tê wateya hevkariya wê, ev jî dide xuyakirin ku bêdengiya rêxistinên navnetewî qebûlkirina van sûca ne. Pêwîste ku dewleta Tirk ya dagirker bi van sûcên dijmirovî di dadgihên navnetewîde were dadgihkirin. Wekî tê zanîn ku îro dîsa gel li ser piyane û li qadan e, em bi hêvîne ku êdî dawiya dagirkeriyê were û ji herêmên me werin derxistin. Her wiha ev serhildan pêwîste bibe xete çareseriyê û mafê her malbatekî ku ji mal û warê xwe bi darêzorê hatine derxistin, bi dest were xistin û xwestekên wan were bi cih kirin.

**QSD`ê û Rêveberiya xweser çareseriya jiyaneke demokiratîk e**

Endama Partiya Yekîtya Demokiratîk (PYD) Arîfa Bekir di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Pêwîste êdî gelên li herêmên dagirkirî jiyana koletî û zorê qebûl nekin û daxwaza xeta demokiratîk a Rêveberiya xweser bikin û bi hêzên QSD`ê re bibin yek, ji ber ku ev çareseriye. Her wiha pêwîste di sîstema Suriyayê de guhertineke mezin a çareseriyê pêkwere û ev çareserî jî ew e ku destê xwe bidin QSD`ê. Ji ber ji destpêka şoreşê û aloziya Suriyê ti kes çareserî bi xwe re na anî, tenê sîstema Rêveberiya Xweser ya demokratîk û QSD`ê bû cihê çareseriyê û demokrasiyê.”

# Her giya li ser koka xwe şîn tê!

**Volqan Elî**

Xebatên propagandatîf ên dewleta Tirk ên li dijî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ne li ser yek mijarê, yan jî li ser yek gelî û ji bo demekê tên meşandin. Heta di wê astê de ye ku her lawaziya me, ji aliyê rêveberiyê be, ji aliyê asayişê ve be, ji aliyê xizmetguzarî û şaredariyê ve be hin caran bêyî ku pergala şerê taybet rasterast beralî bike dikeve xizmeta faşîzma Tirk. Mînak par-pêrar bihayê mazot û benzinê bê qontrol hate zêdekirin. Bû qir û qiyamet. Mesele ne ew e ku em dubare wê mijarê nîqaş bikin, bêjin yan biryarên Rêveberiyê şaş bûn yan jî nerazîbûnên gel şaş bûn, zêde bûn. Lê belê dema ku ew encama derketiye holê digirin dest, sedem çi dibe bila bibe wêneyekî propagandaya li dijî Rêveberiya Xweser tê pêş çavên me. Jixwe dewleta dagirker a Tirk jî dixwaze di nava gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê de wê meylê belav bike: “lê binêrin ev rêveberî nikare we bi rêve bibe, gaz û petrol li welatê we derdikeve lê hê jî benzina we tine. Ma bi ku de diçe evqas petrol?”.

Tê gotin li Bakur û Rojhilatê Sûrî bihayê benzîn û mazotê, di halê hazir de gelekî ji welatên dewlemendên petrolê yên Ereb kêmtir e. Yanî wekî xuya ye mesele ne tenê zêdekirina wî bihayê bû yan jî ne tenê nerehetiya gel e. Ji ber ku pergala dagirkeriyê toreke wisa ya propagandaya dijber ava kiriye, kêmasî û nehişyariyeke me ya herî biçûk, çi ji aliyê rêveberiyê dibe û çi ji aliyê gel dibe neyekser jî be dikeve xizmeta şerê propagandatîf ê neviyên Osmaniyên nû.

Vê xizmetê kî ji neviyên Jon Turkên ku Şêx Abdulselam Barzanî îdam kirine re dike?

**Deng û rengê PDK!**

Balkêş e, heta ku PDK’ê ala xiyanetê berz ranekir û deriyê çiyayên Zagros ku artêşên Îskender jî lê terpilîbû li artêşa neviyên Turaniyan venekir, ti kesî nedikarî ku bi xweşikî û bêhnfirehî rexne li Rûdaw, K24 û hwd. bigirin. Lê hezar mixabin e ku ew Rûdawa bi nav (!) û deng û dilbixwîn ku ji aliyê komara Tirk ve hatiye avakirin, yek ji van lingên propagandaya reşkirinê ye. Ev ne îdîa yan jî îftirayek e. Di belgeyeke ku çavkaniya wê Enqere ye de derbas dibe; dibêje ‘divê em li Bakurê Iraqê televziyonekê ava bikin. Ku bi her awayê xebata Apociyan reş bike. Divê zimanê wê jî Kurdiya herêmê be (Soranî) be. Da ku gel li me guhdar bike.’ Ev belge di salên borî de di medyaya dijîtal de bi Tirkî hatibû weşandin. Dema ku em li ber ronahiya vê heqîqetê ji xwe re li ser weşana Rûdawê difikirin gelek tişt wekî tava li azman ronî dibe.

Ji beriya şerê emperyalîstan li ser Ûkraynayeyê bû. Koçberiya li ser sînorê Polonya û Belarûsyayê di rojevê de bû. Wekî tê zanîn bi dehezaran koçber li wê derê kom bibûn. Piraniya wan Kurdên ji Başûr bûn, kêm be jî yên ji Rojava jî hebûn. Rûdawê di bernameyeke xwe de hin koçberên jin ên ji Rojava dida axavtin. Qaşo dianîn ziman ku rewşa tendirustiyê û aboriyê li Rojava (Kobanê û Dêrik) çiqas ne baş e. Di belgeyên dewleta Tirk ku di dîrokên cuda de wekî talîmat çûne ber destê saziyên wan ên eleqadar de girîngiyeke mezin ji bo koçberkirina Kurdên Rojava heye. Di belgeyeke veşartî ya ji beriya salan eşkere bûye de tê gotin, “pêwîst e em herêmê, ji gel vale bikin. Divê em van kesan li Tirkiyê û bakurê Iraqê di kampan de bi cih bikin.” wekî tê zanîn jî ‘bakurê Iraqê’ Başurê Kurdistanê ye û di bin serweriya PDK’ê de ye. Yanî maneyê vê ew e ku kampên li Başûr ji bo penaberan hatine vekirin bi agahî û fînanseya dagirkeriya Tirk e.

Dîsa di demên derbas bûyî de hin bûyerên bi asayişê re eleqadar, di heman medyayê de tê bidestgirtin. Rastbûn yan jî nerastbûna van bûyeran li aliyekî bimîne, dema ku mirov tîne bîra xwe ku Rûdaw ji aliyê dewleta faşîst a Tirk ve hatiye avakirin armanca nûçeyên wisa tê fêmkirin. Armanc ew e ku saziyên girêdayî Rêveberiya Xweser werin reşkirin, mejiyê gel şêlo bibe ku wisa bifikire “ma gelo me ji bo vê asayişa işkence li însanan dike evqas ked û xwêdan da?”.

Jixwe di belgeyên îstixbarî ku dewleta Tirk wekî talîmat ji sîxur û ajanên xwe re rêkirine de wisa dibêje; “li herêmê ji bo ku baweriya bi Rêveberiyê kêm bibe divê em nakokiyên hene bi kar bînin. Heta eger nakokî nebin jî pêwîst e em derxin, peyda bikin.”



## Mesûd Berzanî çima çû Bexdayê?

**Ahmet Aktaş**

Piştî 6 selan, hema ji nişka ve rabû çû Bexdayê! Ev gera wî bala herkesî kişand û pirs li pey pirsê hat rêz kirin! Her çendîn pirs bê bersiv mabin jî, lê ji ber ku pirêza vî kesî, kûr û birazayê wî li ber çava ye, êdî armanca çûna wî an jî kê ew bi lez şand Bexdayê diyar e! Ya fermandarê wî yê nêz Receb Erdogan an jî fermandarê gewre ji DYE yê, ev kar da destê wî û xist ser rêya diplomasiya malxerab.

Berî sê mehan Receb Erdogan jî, derketibû gera Bexdayê û Erbîlê, dibe ku zemîn ji Mesûd re, xweş kir û li pey xwe Mesûd şand, ji bo ku projeya xwe dewam bikin. Erê mijarên rojevên gerên xwe gelek zelal aşkere nekiribin, belê Receb Erdogan, dijberiya xwe ya PKK’ê li her qonaxê pir aşkere digot.

Jixwe êdî li pey ger û gotinên vî fermandarê qirkerê gelê Kurdistanê, li pey hev hinek bûyeran rûdan. Êrîş û şewatên hinek deveran destpêkir û ya sosret, kiryarên van bûyeran PKK’ê û YNK’ê nîşan dan! Li gel ku hinek ji van bûyeran, komên tirkimenên ser bi dewleta tirk ve hildan ser milê xwe jî, Nêçîrvanê biraza û zavayê Mesûd Berzanî, got “na xêr PKK’ê û YNK’ê ev kara kiri ne”!

Li gel van bûyerên qirêj dewleta tirk, ne bi tinê li seranserê sînorê Bakur û Başûr(ji herêma Xakurkê heta herêma Dihokê)ê Kurdistanê, belê êdî bi sedan maşîn û seyarên xwe yên bi zirxê pola tank û hwd. di rêyên qîrê re kişandin nava Başûrê Kurdistanê û li van deverên gelnişîn baregeh ava kirin. Armanca wan ev e ku li seranserî sînorê herêmê ji gundiyan vala bikin û weke herêmên leşkerî ava bikin.

Helbet li goreyî tê dîtin, ev tevgêra qirkerî û dagirkerî, di pêşengiya faşîzma AKP-MHP’ê de bi hevkariya Rêveberiya Bexdayê û Mesûdê Berzanî ve pêktê. Belê li vira mijara derdikeve pêş û balkêş, rola Mesûdê Berzanî ye! Ji ber ku di 3.7.2024 de, li vê herêma mijara gotinê ye, tevgêra dewleta tirk a xwe bicihkirin û êrîşên ezmanî û bejahî gûrtir bûn.

De îca xala balkêştir ev e ku; dema êrîşa di 26.8.2016 de, derbaskirina sînorê Sûriyeyê ya li ser Cerablûsê û derbaskirina sînorê Iraqê ya li herêma Çelê, Mesûdê Berzanî di heman rojê de li Enqereyê bû. Piştî 9 salan di 3.7.2024 de, dîsan roja destpêka êrîşên dagirkeriyê li ser herdû herêman, vê carê Mesûdê Berzanî li Bexdayê bû.

Me gelo dibe ku van bûyeran hema jixweber(xwezayî) wisa(tesadufî) pêk hatibin?

Na xêr, şopa pirezeyên van kesên ji rêveberên vê malbatê, tije xwîna birakujî û xiyanetê ye.

Li her çar parçeyên Kurdistanê, li gel dewletên mêtinger û qirker xwîna gelê Kurdistanê rijandine, heta qirikê destên wan di xwîna gel de ye. Xwedêgiravî Mesûd gotibû, “heta ez sax bim birakujî nabe”! Ji her alî ve û bi taybetî bi derewîniyên çawa ew fermandarê xwe Receb dişibin hev! Êdî ti hêviya biratî an kurdîtî ji van kesên xayin nabe, bi tinê çarê; li himberî wan berxwedan e!



# Muzafer Ayata: Ew deyndarê gelê xwe bûn, em jî deyndarê wan in

Endamê Komîteya Rêveber Ya PKK’ê Muzafer Ayata da dîyarkirin ku di zindana Amedê de ciwanên Kurdistanê bi ruhê fedayî li ber xwe dan û şehîd bûn. Her wiha Ayata destnîşan kir ku berxwedaniya 14’ê Tîrmehê bû nexşerêyek ji bona pêşeroja ciwanên Kurdistanê.

**Navenda Nûçeyan**


Endamê Rêvebir yê PKK û şahîdê buyera 14’ê Tîrmehê Muzafer Ayata di derbarê salvegera 14’ê Tîrmehê de pirsên rojnameya me bersivandin û naveroka hevpeyvînê weha bû:

**1- Hûn wekî şahîdê berxwedana 14’ê Tîrmehê, berxwedana 14’ê Tîrmehê heya çi astê bandora xwe li ser Tevgera Azadiyê û bi taybet jî şoreşa 19’ê Tîrmehê, kir?**

Di sala 1926‘an piştî serhildana Agirî hate belavkirin, di li ser kûntarên çîyayên Araratê digotin Kurdistana Xeyalî li wir hat veşartin. Derbeya 12’ê Îlona 1980‘î li Tirkiyê nîjadperestîyek di asta jor de dihat meşandin. Bi pêşengtîya serokkomarê wê demê Kenan Evren derbeya leşkerî hat pêkanîn. Di wê demê de şoreşgerî bi taybet ji aliyê ciwanên ku zanîngeh dixwendin, dihat meşandin. Gelek ciwan bi kelecanek mezin tevlî tevgerên şoreşgerî yên çepgirên Tirk dibûn. Ev çirûsk di nav civaka gelê kurd jî ronahiya xwe li civaka kurd kir. Derbeya leşkerî ya ku di 1980‘î de pêk hatiye, ji bona civaka kurd jî dihate wateya tekoşîn û berxwedanîyê. Ji ber civak di wê astê de bû ku xeyalên wê civakê jî hatibûn qedexekirin. Ji ber wê sedemê piştî destpêkirina derbeya leşkerî ya bi pêşengtîya Kenan Evren de destpêkir, gelek şoreşger û ciwanên kurd jî hatin girtin û xistin zindanên dewleta Tirk ya dagirker. Bûyerên wê demê ne li hemberî rêxistinekê tenê dihat kirin, li hemberî gelekî dihat meşandin. Yek zîndana ku şoreşgerê kurd tê de dihatin dîlgirtin jî, zîndana Amedê ya leşkerî hejmara 5‘emîn bû. Li vir berpirsê girtîgehê yê ku taybet di aliyê cunta tirk ve hatîye hilbijartin serbazê tirk Esat Oktay Yildiran bû. Bi pêşengtîya Yildiran û gardîyanên zîndanê pir zext û zordarî ser şoreşgerên girtîgehê de diman dihat meşandin. Ji ber nepejirandina li van kiryaran, di dîroka 14‘ê Tîrmeha 1982‘an de bi pêşengtîya gelek şoreşgerên wê demê wek; Kemal Pîr, Xeyrî Dûrmûş, Elî Çîçek û Akîf Yilmaz Mustafa Karasû, Fuat Çavgun û Fuat Kav jê tevlî bûn û dest bi rojiya mirinê kirin. Li wan berxwederan 9 Îlona 1982‘an Kemal û piştra ji şahadetên şoreşgerên din hatin jîyan kirin. 12 Îlonê Xeyrî Durmuş li piştra jî Elî Çîçek û Akîf Yilmaz di wê berxwedanîyê de xwe feda kirin. Van pakrewanan heya nefesa xwe ya dawî jî, berxwedanî kirin û şehîd bûn. Xeyrî Dûrmûş hênase xwe ya dawî de jî anî ser ziman û got ‘ Ez deyndarê gelê xwe me’. Ji dîrokê û heya avakirina partiya me PKK’ê û gelê Kurd, ji bo parastina çand, hebûn û xaka xwe li ber xwe daye. Çanda berxwedanê, li Kurdistanê vediguherê şêwaza jiyana gelê me. Lê ji ber pirî caran bê pêşengî, bê bîrdozî û zanistî berxwedan pêşketiye, gelê me êşên mezin jiyan kiriye. Lê berxwedana 14’ê Tîrmehê weke daneheva tevahî vê dîroka gelê me ya berxwedêr, bi şêwazekî nû, ku emsala xwe çênebûye pêşdikeve. Ev berxwedan, bi zanebûna fikir, bawerî, felsefe, bîrdozî û şêwazekî nû yê tekoşînê hate pêşxistin. Ev şêwazê nû yê berxwedana bi zanistî pêşket bi heqîqeta Rêber Apo hate avakirin. Li Kurdistanê tovên vê berxwedanê hate avêtin, bi demê re veguherî tekoşîna gel a şoreşgerî. Li hemberî feraseta dewleta Tirk a darbekar, faşîst, dagirker û qirker berxwedana dîrokî a 14’ê Tîrmehê ji bo gelê me yê li her çar parçeyê Kurdistanê û jina Kurd bûye destpêka demekî nû ya tekoşîna xwebûnê. Êdî gelê Kurd, ji bo avakirina jiyaneke bi rûmet û bi destxistina nasnameya azad ev berxwedana dîrokî hembêz kir, xwedî lê derket û di oxira domandina vê berxwedanê de keç û xortên herî hêja kirin berdêl. Berxwedana ku di pêşengtiya Kemal, Xeyrî û Sarayan de pêşket li Kurdistanê bû bingeha gav avêtina pêngava 15 Tebaxê û avêtina tova şerê gel ê şoreşgerî. Gotina ‘berxwedan jîyanê’dî li Kurdistanê bû bingeha felsefeya jiyana azad. Ev tekoşînê bandora xwe li ser şoreşa 19 Tirmehê jî da avakirin. Ev berxwedanîya bi pêşengtîya Elî Çîçekan de destpêkir bo tovê jîyanê ya şoreşa Rojava li çandî. Berxwedanîya 14 Tîrmehê bû nexşerêyek şoreşa 19 Tîrmehê.

**2- Di roj îro de dema em berxwedana 14’ê Tirmehê dinirxinîn, em dikarin çawa kesayetê kurd bigirin dest?**

Ji bona ku gelê kurd bibe mafdar ji bona hin heqê xwe yên xwezayî dest bixe, pêwîste tekoşîna xwe xurt bike. 4 dewleta axa Kurdistanê parve kirine, bê ku tekoşîn bê kirin ti rêya cûda nîne ku gelê kurd xweserîya xwe dest bixin. Ev rastî jî di 100 salên di dawî de mîsoger bû. Zarokên kurd ev 100 salin li gor bernameyên her 4 dewletên dagirker tên perwerde kirin, ji ziman û çanda xwe dûr tên xistin. Ji ber ku ferasetên kurdên berê re êdî nema dihate jîyan kirin. Weke bijîşkê ku nexweşê xwe derman bike, ji bona gelê kurd jî ev derman pêwîst bû. Ev derman jî ji alîyê tevgera azadiyê û Rêber Apo ve hat peydakirin û gelê Kurdistanê hat derman kirin. Li kêleka wê berxwedaniyê jî, xiyanêtên di asta jor de jî hatin jîyan kirin. Hewldan kirin ku bi xiyanetê vîna şorşegeran bidin şikandin. Dîroka Kurdistanê de yekemîn care tevgerek 50 sale bê navber di tekoşîna xwe de berdewam dike. Di dîroka cîhanê de jî, cara yekê ku hemû netew û ol derdora rêxistinekê kom dibin. Ev bi saya felsefeya Rêber Apo pêk hat. Berê navê kurd û Kurdistanê di fermîyeta ti dewletan de tune bû, heya ku bi ti awahî kurd nedihatin pejirandin. Bi saya Rêber Apo yekitîyek di nava gelê kurd de ava bû û Kurdistanî bi derdorê ramanên Rêber Apo bûn xelekek. Lê tevgerên wek PDK‘ê jî bi ti awayî destûr nadin yêkîtî li derdorê kurdan ava bibe. Rêberê gelan Rêber Apo niha ev nêzî 25 salin li gîrtîgeha Îmraliyê de dîl tê girtin. Ji ber ku giştî cîhan bi wê agahdare ku, bê ramanên Rêber Apo ti çareserî ne pêkane li Rojhilata Navîn û Kurdistanê. Dema kurd nebin yek nikarin bi ti awayî dujmin bide sekinandin. Bi rihê 14’ê Tîrmehê yên Xeyrî û Elî’yan û bi şoreşa 19 Tîrmehê dibe kurd û Kurdistanî xwe bigirin dest.



**3- Ji bona salvegera 14 Tîrmehê ya ku bi berxwedanîya Xeyrî û Kemal‘an pêk hatîye, peyama we çi ye?**

Wan şoreşgeran di nav ciwanên Kurdistanê de, di bîra mirovan de cihekî xwe taybet dan avakirin. Dujmin hewil dida ku hertim kurdan bê dîrok û bê zanist bihêle. Dîroka Kurdistanê hertim ne hiştin ti kes bi ti awayî fêr bibe. Ji ber ku dîroka wan reşe û hertim li hemberî gelan di nava zextan de ne. Mînakên berxwedanîyê Elî, Akif, Xeyrî û Kemal in. Pêwîste ciwanên kurd di bin bandoriye şerê taybet de nemînin. Rêya berxwedanî û serhildanê ji xwe re bingeh bigirin. Ev hevalan ne, giştî jî ciwan bûn. Temenê Elî Çîçek di wê demê da 20 salî ye. Ew di vî temenî de berxwedanî pêş xist cane xwe feda kir. Bangawazîya min ji bona ciwanên her çar parçê Kurdistanê ye, bi rihê Elîyan yên ciwan têbikoşin. Li wan mirovan bi zanebûn ji bona oxura gelekê rihê xwe feda kirin. Ev tiştek ne hêsan e. Bîranên wan dê dilê me tevahî Kurdistanê de ye. Li ser vê salvegara rojîya berxwedanê ya girtigeha Amedê em şehîdên doza azadîyê giştî bibîrtînin û soza şopandina rêya wan dûbare dikin.

# Di 6 mehan de li Sûriyê 142 zarok hatine kuştin

**Navenda Nûçeyan**

Di encama topbarana hikumeta Şamê, gule û tobarana dewleta Tirk a dagirke û çeteyên wê, êrişên çeteyên DAIŞ’ê, bermahiyên şer û mayîn, pevçûnên malbatî û guleyên bê serbûber, li Sûriyê di nava 6 mehên borî de 142 zarok hatine kuştin,

Ji destpêka aloziya Sûriyê ve yên herî zêde zerar dîtin, sivîl bûn. şerê ku di navbera hikumeta Şamê û çeteyên girêdayî tirkiyê ve, herwiha êrişên dewleta Tirk a dagirker herî zêde zarok bûn qurabî, zerar dîtin û işkence li wan hat kirin.

Li gorî rapora Rewangeha Sûriyê ya Mafê mirovan ku navbenda Wê li Lundunê ye, di 6 mehên borî de 142 li tevahiya Sûriyê hatine kuştin.

Jimara Zarokên ku di 6 mehên borî de li Sûriyê hatine kuştin wiha ne:

**Di meha çile de 29 zarok di bûyerên cûda de hatine kuştin :**

-Zrokek li ser destê çetên dewleta Tirk li herêmên dagirkirî hate kuştin.
-7 zarok di şerê di navbera malbatan û bi guleyên bê serûber hatine kuştin.
- 2 aroke ne diyare bi çawa hatiye kuştin.
-7 Zarok bi bermahiyên şer hatine kuştin.
-5 Zarok bi topbarana hikumeta Şamê ya li ser herêmên di bin destê çeteyên dewleta Tirk de hatine kuştin.
- Zarkek li ser destê malbata xwe hatiye kuştin.
- Zarokek li ser destê çeteên DAIŞ’ê hatiye kuştin.
- Zarokek li ser destê cendirmeyên dewleta Tirk hatiye kuştin.
- 2 zarok di tobarana esmanî de ya Urdinê de hatine kuştin.
- 2 zarok bi mayînan hatine kuştin.



**Di meha Sibatê de 24 zarok bi awayên cûda hatine kuştin û wiha ne:**

-3zarok di pevçûn û şerê di navbera malbatan de hatine kuştin.
-14 zarok ji ber bermahiyên şer hatine kuştin.
-Zarokek ji ber toparana hikumeta Şamê hatiye kuştin.
-4zarok di bûyerên ne zelal de hatine kuştin.
- Zarokek ji aliyê çeteyên DAIŞ’ê ve hatiye kuştin.
- Zarokek di encama teqîna mayinekê de hatiye kuştin.

**Di meha adarê de 25 zarok bi awayên cûda hatine kuştin û wiha ne:**

-4zarok di pevçûnên di navbera malbata de û bi guleyên bêserûber hatine kuştin.
-Zarokek ji aliyê çetên dewleta Tirk a dagirker ve hatiye kuştin.
- 8 zarok bi bermahiyên şer hatine kuştin.
-Zarokek di toparana hikumeta Şamê de hatiye kuştin.
-7 zarok di bûyerên ne zelal de hatine kuştin.
-2 zarok di encama teqîna erebeyên bombebarkirî de hatine kuştin.
- 2 zarok di encama teqîna mayînan de hatine kuştin.

**Di meha Nîsanê de 24 zarok di bûyerên cûda hatine kuştin û wiha ne:**

-9 zarok di bûyerên pevçûnên di navbera malbatan de hatine kuştin.
-Zarokek bi bermahiyên şer hate kuştin.
-3 zarok bi guleyên hikumeta Şamê hatine kuştion.
-2 zarok di bûyerên ne zelal de hatine kuştin.
- 8 zarok di encama teqîna mayînan de hatine kuştin.

Gulan

Di meha gulanê de 21 zarok bi awayên cûda hatine kuştin û wiha ne:
-5 zarok di pevçûnên di navbera malbatan de û bi guleyên bêserûber hatine kuştin.ç
-4 zarok bi bermahiyên şer hatine kuştin.
-4 zarok bi topbaran hikumeta Şamê hatine kuştin.
- 6 zarok di bûyerên ne zelal de hatine kuştin.
-Zarokek di topbaran Îsrayîlê de hatiye kuştin.
-Zarokek di topbaran artêşa Tirk de hatiye kuştin.

Tîrmeh

Di meha Tîrmehê de 19 zarok di bûyerên cûda de hatine kuştin û wiha ne:
-Zarokek ji aliyê çeteyên dewleta Tirk ve hatiye kuştin.
-Zarokek di encama pevçûnên di navbera malbatan de hatiye kuştin.
-7 zarok bi bermahiyên şer hatine kuştin.
-Zarokek di topbarana hikumeta Şamê de hatiye kuştin.
- 5zarok di bûyerên ne zelal de hatine kuştin.
-3 zarok di encama teqîna mayînan de hatine kuştin.
-Zarokek ji aliyê artêşa urdinê ve hatiye kuştin.